# DÎROK

## NAVÎN 2

2019/2020

## AMADEKAR

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya dîrokê ve hatiye amadekirin.**

## LÊVEGER

- **Komîteya Şopandinê**
- **Komîteya Fotoşopê**
- **Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK

**BEŞAYEKEM ............................................................................7**

ISKENDER Û HELENÎZIM ............................................................................ 8
IMPERATORIYA ROMAYÊ ............................................................................ 12
IMPERATORIYA ROMAYÊ Û BERXWEDANA GELAN ............................................ 16
CIVAKA KOMAGENEYÊ ............................................................................ 19
IMPERATORIYA SASANÊ 224-651 P.Z ............................................................ 22
LI HEMBER DESTHILATDARIYA SASANAN MAZDEKÎ ........................................ 25

**BEŞA DUYEM ............................................................................27**

HZ. MIHEMED ............................................................................ 28
FELSEFA HZ. MIHEMED ............................................................................ 31
DERBASBÛNA ISLAMÊ YA NAVA KURDISTANÊ .................................................. 34
ISLAMA DIJBER Û SERDEMA EMEWÎ (661-750) .................................................. 36
SERDEMA EBASIYAN (750-1258)............................................................... 39
LI ROJHILATA NAVÎN PÊŞKETINA HIZIR Û DOGMATÎZMA OLÎ ......................... 42
TEVGERÊN LI DIJÎ ISLAMA DIJBER (1) ........................................................ 45
TEVGERÊN LI DIJÎ ISLAMA DIJBER (2) ........................................................ 47
MÎRNIŞÎNÊN KURD ÊN DI DEMA ISLAMÊ DE (1) ............................................ 50
MÎRNIŞÎNÊN KURD ÊN DI DEMA ISLAMÊ DE (2) ............................................ 54

**BEŞA SÊYEM ............................................................................59**

ÊRÎŞÊN XAÇPERESTAN ............................................................................ 60
IMPERATORIYA SELÇÛQÎ ............................................................................ 63
DAGIRKERIYA MOXOLAN ............................................................................ 67
ÊRÎŞÊN HOLAKO ............................................................................ 69

**BEŞA ÇAREM ............................................................................73**

IMPERATORIYA OSMANÎ ............................................................................ 74
DEWLETA SEFEWÎ ............................................................................ 77
PEYMANÊN DI NAVBERA KURD Û OSMANIYAN DE .......................................... 79
PEYMANA IDRÎSÊ BEDLÎSÎ Û YAWÛZ SELÎM ................................................... 82
SERHILDANÊN GEL LI HEMBER OSMANIYAN .................................................. 84
REWŞA ROJHILATÊ KURDISTANÊ DI BIN DESTHILATDARIYA SEFEWIYAN DE ............................................................................ 88
PEYMANA QESRA ŞÊRÎN ............................................................................ 91
FERHENGOK ............................................................................ 94

# BEŞA YEKEM

* Iskender û Helenîzim
* Imperatoriya Romayê
* Berxwedana gelan li hember koledariya Imperatoriya Romayê
* Civaka Komegena
* Imperatoriya Sasanan
* Manî
* Mazdekî

**WANE 1**

## ISKENDER Û HELENÎZIM

Iskenderê mezin kurê Fîlîpê duyemîn qralê Makdonyayê bû. Di zarokatiya wî de, mamosteyê wî Arîsto bû. Nêrîna Aristo ya ji bo netewên derveyî Yewnanê, cihê xwe di hizir û bîra Iskender de digire. Arîsto, ji bo gelên Rojhilatê digot: "Tiral û gêj in". Girêdayî wê, gotibû: "Pêwîst e ev netew, weke moriyan bên perçiqandin".



**Iskender**

Dema bavê wî tê kuştin, Iskenderê Mezin tê şûna wî. Destpêkê herêmên Yewnanan dagir dike û piştre bi ser Sûriye û Filistînê ve diçe û berê xwe dide Misrê. Dema van welatan bi dest dixe, berê xwe dide axa Persan. Di sala 331'ê B.Z de, Darîusê sêyem di şerê Gawgemêla de dişkîne û dawî li imperatoriya Persê tîne. Berê xwe dide Persepolisê (Şîraza îro) û wê deverê jî, dixe bin destê xwe. Piştre berê xwe dide Hindistanê û wê dixe bin destê xwe, dema vedigere Yewnanê li Babilê di sala 323 yê B.Z de bi tayê dimire. Di navbera fermandarên wî de şerên desthiladariyê çêdibe nêzî çil salî ev şer berdewam dike û piştî vî şerî imperatoriya Iskender dibe çar beş:

1. Yewnan û Makdoniya dikeve destê xanedaniya Antîgonos.
2. Anatoliya dikeve bin xanedana Atalît ku navenda wî Bergama ye.
3. Misir û derdora wê dikeve destê Ptolemaîos navenda wê Iskenderiyê ye.
4. Mezopotamiya û Asya jî dikeve destê Selefkos ya ku navenda wê Entakiya ye.

Dema Iskender berê xwe dide Rojhilatê, pir bi çanda wê bandor dibe. Êdî nerînên mamosteyê xwe Arîsto vala derdixe û digihêje baweriyekê ku gelê Rojhilatê ne tiral û gêj in, lê xwediyê çandeke dewlemend in, ji ber vê yekê Sentezeke çandî nû ava dike û bi deh hezaran leşkerên Yewnanan bi jinên Rojhilatê ve



**Avahîsaziya Helenîstê**

dide zewicandin. Ev senteza çandî weke Helenîst (hevîra çanda Rojhilat û Rojavayê), rave dike. Di salên 330 -150 yê B.Z de, bi bandor bû.Tevahî Rojhilatê di van salan de ket bin bandora Helenîstê de. Ev nêzîkatî muhra xwe li avahî û hunera wê demê xist û bi navê Helenîstê, tê nasîn.

## Xanedaniya Partê:

Partan di salên 249 ê B.Z û 228 ê Z de, li Îran, Mezopotamya, Anatolya û li Rojhilata Navînê, pêşengî kirine.




Part bi koka xwe ji netewên Aryen in. Berxwedaniya Partan li Îranê, herêma Xorasanê li pêş dikeve û êla Arşakan pêşengiya vê berxwedanê dike. Li dijî dagirkirina Qraliyeta Selefkosan a ku dagirkerî û koletî li ser civakan dabû avakirin, Êlên Arşakan bi şêweyê konfederasyona êlan xwe birêxistin dikin. Li ser bingehê vê sazûmaniyê, li dijî Selefkosan têkoşînê dikin û wan ji herêmê der dixin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Nêrînên Arîsto yên di derbarê Rojhilatê de, çi ne?
2. Piştî ku Iskender tê desthilatdariyê, çi dike?
3. Iskender kengî, li ku û çawa dimire?
4. Hevokên rast bi (√) û yên şaş bi (×) nîşan bike:
   - **a.** Iskender bi hezaran leşkerên xwe bi jinên Rojhilatê re zewicandin.
   - **b.** Partan li dijî Iskender serî hildane.
   - **c.** Êla Arşakan pêşengiya berxwedana partan dikir.

**WANE 2**

## IMPERATORIYA ROMAYÊ

Imbiratoriya Romayê di sê pêvajoyan de derbas dibe:

- Dema şanişînê (753- 510) B.Z.
- Dema komarê (510 -27) B.Z.
- Dema imperatoriyê 27 ê B.Z 395 ê Z.

### 1. Dema Şanişînê (753-510) B.Z:




Li gorî lêkolîn û nêrînên heyî diyar dikin ku di sala 1000 ê B.Z de, êlên bi navê Albayî ji stemkariya Etrûskan direvin û ji bo ku xwe biparêzin, Romayê ava dikin. Albayî piraniya xwe êlên koçer in ên ku bi lawirvaniyê ve mijûl dibin. Ji bo vê jî, dibêjin ku "Şivanan Roma ava kiriye". Piştre Etrûsk bi Albayan re şer dikin û Romayê ji destên wan derdixin. Etrûsk, Romayê li gorî têgihiştina, xwe ava dikin. Li ser wan hîman jî, rêveberiyê didin avakirin. Lê, bi demê re Etrûsk lewaz dibin û Romayî bajêr digirin destê xwe. Piştî birêveberî dikeve destê Romayê, ji derveyî Etrûskiyan, pergaleke din didin rûniştandin. Di dema Etrûskan de birêverbirina Romayê bi pergala şanişînê tê meşandin.

## 2. Dema Komarê (510- 27) B.Z:

Bi demê re di şanişîna Romayê de perleman û encumenên gel jî ava dibin. Bi vî şêweyî bingehê komarê ava dikin. Dema ku komara Romayê tê avakirin, ev komar hemû gelan nagire nava xwe. Ev komar mirovên feqîr û belengaz, ango çîna jêr a bindest nedigirt nava xwe. Ji van civakan re, Pleb dihat gotin. Ev bêmafiya ku dihat kirin, rê li ber nerazîbûn û serhildanên Pleban vedikir. Pleb ji bo ku Roma baştir û demokratir were birêvebirin, têkoşînên pir mezin dan meşandin, tam negihîştibin encamên xwe jî, lê bi demê re hinek guherîn hatin çêkirin. Mînak: Di salên 450 yê B.Z de, zagonên "12 tablêtan" hatin avakirin. Ev zagon ji bo hemû hemwelatiyan bûn. Têkoşîn û berxwedana Pleban ji bo civakên demokratîk, gaveke bingehîn bû.



**Perlemana Romayê**

## 3. Dema Imperatoriyê 27 B.Z – 395 Z:

Komara Romayê roj bi roj mezin dibe û ber bi imperatoriyeke mezin ve diçe. Di sala 27`an de imperatoriya Romayê bi birêveberiya Oktafiyos (Agustus) hat damezrandin.

Di dawiya sedsalên berî zayînê de Yolyos Sêzer êrîşên xwe li ser Galya (Fransa), Rojhilatê Deryaya Spî û Anatolyayê ber bi dawiyê ve dibe û Misr dikeve bin desthilatdariya Romayê. Misr, weke herêmekê bi Romayê ve tê girêdan. Roma piştî demekê û bi şûn de, ji komarê derbasî imperatoriyê dibe.

Di sedsala 4`an de imperatorî dibe du perçe, parçeyê Rojavayê yê ku paytexta wê Roma ye (di sala 476`an de dikeve bin destê Almanan) û parçeyê Rojhilatê (Bîzans) ê ku paytexta wê bû Konstantîn ( Istanbola îro) di sala 1453`an de dikeve bin destê Osmaniyan de.



**Kolosyom**

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Şanişîna Romayê çawa tê avakirin?
2. Peleb kî ne û çima serhildan li hember komarê rakirin?
3. Di dema komarê de, şêweyê birêveberiyê çawa bû?
4. Bersiva rast hilbijêre:

**a.** Demezrînerê imperatoriya Romayê:
- Antonyos
- Sêzer
- Agostos

**b.** Di sedsala 4`an de, imperatoriya Romayê dibe:
- Du parçe
- Sê parçe
- Çar parçe


**c.** Hilweşîna imperatoriya Bîzansî, di sala:
- 1483
- 1453
- 1545

WANE 3

## IMPERATORIYA ROMAYÊ Û BERXWEDANA GELAN

Li hemberî çewisandinên giran ên imperatoriya Romayê, li gelek deveran nerazîbûn, serhildan û berxwedanên gelan dest pê kirin. Beşek ji van berxwedanan ên koleyan e, beşek berxwedanên olî ne û beşek din jî ya jinê ye.

### 1. Berxwedana Koleyan:




**Spartakos**

Di dema imperatoriya Romayê de, mirov ji hemû deverên ku Romanan dagir kiribûn, dihatin dîlgirtin û ji bo xwe mîna koleyan bi kar tanîn. Ev kole di hemû karên giran de weke lawiran dihatin bikaranîn û li bazaran dihatin firotin. Her wiha weke lîstokekê ji bo imperatorên Romayê dihatin bikaranîn û ji bo kêfxweşiya wan, di qadan de bi dirindeyan re didan şerkirin.

Li hemberî vê rewşê, kole bi pêşengiya Spartakos, rabûn serhildanê. Di derbarê jiyan wî de beriya serhildanê agahiyên misoger tune ne. Hin jêder dibêjin ku ji biçûkaniya xwe ve, di dibistanên koleyan de mezin dibe û ji bo ku di pêşbirkên bi lawirên dirinde re bê bikaranîn, tê perwerdekirin, jêderên din jî dibêjin ku di artêşa Romayê de fermandarek bû, ji artêşê direve lê tê dîlgirtin û kolekirin, hin jêder jî dibêjin Trakyayî ye li himber dagirkeriya Romayê şer kiriye û hatiye girtin. Di sala 73 yê B.Z de, koleyan li derdora xwe birêxistin dike û dest bi serhildanê dike. Ev serhildan belavî hemû deverên imperatoriyê dibe. Senato, gelek êrîşan bi ser vê serhildanê de dibe, lê ew hewildan vala derdiketin, heta ku artêşa mezin bi serpereştiya

Markos Lîkînyos bi ser wan de diçe û serhildanê ji holê radike. Di şer de Spartakos tê kuştin û bi hezaran kole tên çarmîxkirin û bi vê şêwaza hovane, dawî li serhildanê tê.

## 2. Berxwedana olî bi pêşengiya Hz. Îsa:



**Hz. Îsa**

Hz. Îsa ji kevneşopiya Hz. Birahîm tê û divê mirov wê weke yekemîn rêxistina civakî ya xizanan a dîrokî pênase bike. Ji ber ku derketina Hz. Îsa gerdûnî, mirovî, demokratîk û komînal bû. Derketina Hz. Îsa, bêyî ku tu sînoran ji bo xwe binase, berteka hevbeş a hemû beşên civakê, da der. Bi rastî, imperatoriya Romayê, di serdema xwe de imperatoriya herî mezin bû ku hema bêje belavî sê parzemînên cîhanê bibû. Li gorî xwe ew  desthilatdarê cîhanê bû û her kes koleyê Romayê bû. Hemû beşên civakê yên ku ziyan ji pergala Romayê didîtin, bi Romayê re di nava nakokiyan de bûn û hêviyeke wan ji "Mesîhê" rizgarker, hebû. Di vê demê de Hz. Îsa, weke rizgarker di dîrokê de cihê xwe girt. Tişta ku ew mezin kiriye , dijberiya pergala Romayê bû. Hz. Îsa li hemberî koletiya gerdûnî ya Romayê bi şêweyekî navnetewî ku karibe bibe gerdûnî û pirsgirêkên hemû mirovan çare bike, rabibû. Ola Hz. Îsa ronî nedît Lê piştî mirina wî, di rêya Hewariyên (navê şagirtên Hz. Îsa) wî de belav bû. Ji ber ku ola Hz. Îsa di nava civaka Romayê de belav bibû, imperatorî neçar ma ku bipejirîne. Bi vî awayî imperator Qestentîn, di sala 312`an de, bi fermana Mîlano xiristiyanîtî weke ola fermî ya imperatoriyê ragihand. Lê dema ku pejirand, li ser bingehê berjewendiyên desthilatdariya xwe pejirand.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1.** Rewşa koleyan di imperatoriya Romayê de, çawa bû?

**2.** Çawa serhildana Spartakos têk çû?

**3.** Çima şoreşa Hz. Îsa weke şoreşa xizanan, tê naskirin?

**4.** Çi tiştî hişt ku Hz. Îsa di nava civakê de mezin bibe?

**WANE 4**

## CIVAKA KOMAGENEYÊ

Komagene bi koka xwe binavkirineke Hêlênî be jî, lê wateya xwe ya kurdî jî heye. Peyva "kom" hîna jî, ji bo komên nîvkoçer û cîwarê wan bi wateya zom tê bikaranîn. Peyva "gen" jî, bi wateya nijad, hoz û êlê tê bikaranîn. Komagene tê wateya cihê êlên nîvkoçer.



**Berhemên Komagene li çiyayê Nemrûdê**


Dema ku Konfederasyona Medan vediguhere imperatoriya Persan, êlên Hûriyan, bi lihevkirina ku hozên Yewnan, Aşur, Ermen û Lûviyan re çêdikin, bi navê Komageneyê, konfederas-yonekê din ava dikin.

Di nava wan êlên ku di hundirê konfederasyona Komegeneyê de cih girtine de, êla herî mezin bi navê Zêlan bûn, ew jî Med bûn. Navê serokê êla Zêlan jî **Mîtrîdatês** bû. Ango ji navê xwedawenda kurd **Mîtrayê** dihat. Jixwe îro jî li çiyayê Nemrûdê peykerên gelek xwedawendên cuda mîna: Ziyos,

Apollon, Mîtra û Herkûl hene. Ji ber vê yekê jî, ji çiyayê Nemrûdê re dibêjin çiyayê xwedayan. Ji bo wê jî gelek dîroknas jî Komageneyê wekî senteza çanda rojhilat û rojavayê dinirxînin. Lê ya rast Komagene nûnertiya herî xurt a şaristaniya demokratîk e. Komagene konfederasyona herî dawî ya pergala çanda civakî bû ku li hember pergala imperatoriyê ango şaristaniya navendî hatibû avakirin.

Konfederasyona Komageneyê herêma Semsur, Meletî, Elezîz, Dîlok, Mereş û heta Rihayê digirte nava erdnîgariya xwe. Çiyayê Nemrûdê navenda wê konfederasyonê bû. Wê demê Kurdistan bi êrişên du hêzan re rû bi rû dima; ew jî Pers û Romayê bûn. Di encama wan şerên desthilatdariyê de Konfederasyona Komageneyê rastî gelek êrîşên Roma û Sasanan tê û di sala 250`yî de ji holê tê rakirin.

## Berxwedana Zenûbiyayê:



**Zenûbiya**

Zenûbiya qiralîçeya Palmêrayê ye. Destpêkê bi hevjînê xwe Ûzeyna re serhildanek li dijî pergala Romayê li dar xist û tevahî Sûriyeyê xist bin kontrola xwe. Zenûbiya bi zîrekbûn û zanebûna xwe navdar bû. Di dema hevjînê xwe de wekî birêveber, pê re kar dike. Piştî ku hevjînê wê tê kuştin, şanişîna Palmêrayê ket destê wê. Li Sûriye, Misir û Asyaya navînê serwer dibe, bi awayekî berfireh çavdêriya xwe li tevahî herêmê dike. Imperatoriya Romayê vê berfirehbûnê weke metirsiyekê li ser hebûna xwe dibîne û artêşan dişîne ser şanişîna Zenûbiyayê û gelek şer di nava wan de diqewimin, heta ku imperatorê Romayê Orilyan Palmêrayê dorpêç kir, serhildana Zenûbiyayê têk bir û wê dîl girt. Dema ku tê dîl girtin û di Qefesê de tê birin ta Romayê hin jêder dibêjin ku di rê de jarê vedixwe û jiyana xwe bi dawî dike û hin jêder jî

dibêjin ku dema li Romayê tê dadgehkirin şûrê leşkerekî jê distîne û xwe dikuje. Herdu jêder jî heman ramanê didin ku wê xweradestkirin nepejirand û xwe kuşt. Tê gotin ku Zenûbiya berî jiyana xwe ji dest bide wiha gotiye "Piştî ku Romayê welatê min dagir kir û xira kir wateya jiyanê nemaye, mirovê ku bêwelat, bêgel û dîlgirtî jiyan bike, mirineke bi rûmet ji xwe re hilbijêre wê çêtir be".

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Li hemberî desthilatdariya imperatoriya Romayê, çi serhildan çêbûn?
2. Komagene, tê çi wateyê û li ku derê jiyane?
3. Konfedrasyona Komageneyê ji kîjan civakan pêk dihat?
4. Çima civaka Komageneyê senteza Rojhilat û Rojavayê ye?
5. Çima imperatoriya Romayê êrîş bi ser Zenûbiyayê ve bir?

**WANE 5**

## IMPERATORIYA SASANÊ 224-651 P.Z

Xanedana Sasanan, piştî hilweşandina xanedana Partan, tê avakirin. Xanedana Sasanan, di destpêka sedsala 3`yan de li Îrana îro herêma Persîsê, bi pêşengiya Ardeşêrê Yekem hatiye avakirin. Li gorî lêkolînan, navê Sasanan ji navê bapîrê Ardeşêr ê bi navê "Sasan" tê.

Di sedsala sêyem de şerê Rom û Persan ê ku li ser desthilatdariyê bû, bi serkeftina Persan encam dibe. Bi vî awayî desthilatdariya li Kurdistanê ji Romayê derbasî Persan dibe. Hewildanên ku çanda Zerdeştiyê ji naveroka xwe bê dûrxistin, mîna ramiyariyekê ji milê hemû desthilatdarên Persan ve, hat meşandin. Di dema Sasanan de ew raman êdî digihêje armanca xwe.

Ji ber ku di dema Sasanan de êdî Zerdeştî bi her awayî ji naveroka xwe hatibû dûrxistin û bibû oleke desthilatdar. Piştî gelek şeran di navbera Mislman û Sasaniyan de, di sala 651`ê de imperatoriya Sasanan ji hêla Mislimanan ve tê rûxandin.



## Li hemberî desthilatdariya Sasanan tevgera Manî:

Di xanedana Sasanan de, ji bo karibin desthilatdariyeke xurt bimeşînin, rahibên Magî (mag bawermendên Zerdeşt in) bi navê ola Zerdeşt, desthilatdariya xwe zêde dikin. Hemû nîvîsên Zerdeşt ji nû ve tên berhevkirin û tên nivîsîn. Lê belê ev rahib dema ku nivîsan amede dikin û dinîvîsin, cewherê ola Zerdeşt diguherînin û bi rêya olê desthilatdariya Sasanan didin rûniştandin.

Li hember êrîşên bîrdozî helwesta civakî ya ku di nava kurdan de li pêş dikeve tevgera Manîtiyê ye. Wek helwesteke civakî di sedsala sêyem de li pêş dikeve û xwe li her deverên Kurdistanê belav dike. Heta sînorên Kurdistanê jî derbas dike. Manîtî mîna tevgereke him olî û him jî civakî li pêş ket; ji ber ku li hember karakterê şaristaniya navendperest, xwest ji nû ve moral û çanda civakî serwer bike. Eger ne ji ber komkujiyên paşverûyên Sasanan bûya, Manîtî jî, wê weke ola xiristiyanî belav bûba. Zanyar di vê mijarê de hemraman in. Tê zanîn ku weke rêbaz belavî Ewrûpayê jî bûye û bandora xwe li Serdema Navîn kiriye.

Manîtî ji peyva **Mana** tê ew jî wateya wê aramî û ronî ye. Ango di bingehê bawariya Manîtiyê de felsefeya ronahiyê heye. Kevneşopiya ku Manîtî xwe dispêrê, kevneşopiya Mîtra û Zerdeşt e. Dijberiya ola Manî ji hêla desthiladarên Sasanan ve tê kirin û bi rengekî hovane Manî tê kuştin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1.** Navê Sasanan ji ku hatiye?

**2.** Çawa imperatoriya Sasanê hat hilweşandin?

**3.** Dema ku rahibên Magî nivîsên Zerdeşt ji nû ve nivîsandin, çi guherîn tê de çêkirin?

**4.** Tevgera Manîtiyê li hember çi derketiye?

**5.** Çima felsefeya Manî weke Xiristiyaniyê belav nebû?

**6.** Çima Manî tê kuştin?

**WANE 6**

## LI HEMBER DESTHILATDARIYA SASANAN MAZDEKÎ

Dema ku dîrok ber bi sedsala pêncem ve tê, kurd hîn jî di bin desthilatdariya Sasanan de ne. Ango 200 sal piştî Manîtiyê, hê jî Magên desthilatdar ên Sasanan li hember çanda Zerdeşt radiwestin. Karakterê şaristaniyê yê çînîtî û desthilatdariyê, serwer dikin.

Li hember vê rewşê, civakê wek helwesteke duyem xwe bi navê Mazdekî dide nîşandan. Mazdek kurdekî ji Hemedanê ye. Tevgera Mazdekî xwe wekî şopdarê çanda Zerdeştiyê û Manîtiyê dide naskirin. Navê xwe jî her çiqasî dibêjin ji pêşengê xwe Mazdek digire, lê ya rastî ji Ahura Mazdaya Zerdeştiyê digire. Mazdeîzim di nava azer, Pers û kurdan de bi rêjeyeke mezin belav bûye. Imperatoriya Sasanê ku bilindbûn û belavbûna vê baweriyê ji xwe re weke metirsiyeke mezin dibîne, li hember wan, çend êrîşên leşkerî pêk tîne. Serhildana Mazdek, ji aliyê Akhûnan (hoz û dewleteke turkan) ve tê perçiqandin, Mazdek radestî Sasanan dikin û wî bi dar ve dikin.

Lê belê, baweriya Mazdekî, hebûna xwe didomîne. Herî dawî, xwe bi navê Huremî li Rojhilata Navînê birêxistin dikin.

### Pîvanên Mazdeîzimê:

1. Parvekirina mal û heyînan; ango aboriya komînal (ev pîvan şopdariya jiyana komînal a çanda Neolîtîkê û Manîtiyê dike).
2. Wekheviya jin û mêr (ev pîvan şopdariya Zerdeştiyê ye).
3. Dijbertiya desthilatdariyê (ev pîvan şopdariya Zerdeştiyê dike).
4. Nexwarina goşt (ev pîvan şopdariya Zerdeştiyê dike).
5. Xwedîtiya taybet wekî çavkaniya hemû xirabiyan e (ev pîvan şopdariya Manîtiyê dike).

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Tevgera Mazdekê navê xwe ji ku digire?
2. Mazdeîzim bandora xwe li kîjan gelan kir?
3. Pîvanên Mazdeîzimê bi hevalên xwe re gotûbêj bike.

# BEŞA DUYEM

* Hz. Mihemed
* Felsefeya Hz. Mihemed
* Derbasbûna islamê ya nava Kurdistanê
* Islama dijber û Serdema Emewiyan
* Serdema Ebasiyan
* Li Rojhilata navînê pêşketina dogmatîzima olî
* Tevgerên li dijî islama dijber
* Mîrnişînên kurd ên dema islamê

**WANE 1**

**HZ. MIHEMED**


## Jînnameya Hz. Mihemed:

Islam yek ji kevneşopiyên Hz. Birahîm e û di Nîvgirava Erebistanê de derketiye. Hz. Mihemed pêxemberê islamê ye û di sala 571`ê de li Mekeyê ji dayîk bûye. Hz. Mihemed ji malbata Haşimî ye û malbata wî Qureyşiyên bazirgan in. Dema temenê wî dibe 25 sal, dikeve xizmeta jina bazirgan a bibandor Xedîce, piştre pêre dizewice. Bi vê zewacê re rewşa xwe ya xizan derbas dike û cihekî xwe di nava çîna navîn de bi dest dixe. Dema dikeve rêya bazirganiya Şam û Mekeyê, ji rahibê Nastûrî (Buheyra) pir agahiyan distîne. Hz. Mihemed di 610`an de ola Islamê radighîne. Bi qasî ku li pêş dikeve û mezin dibe, bi aliyên din ên arîstokrasiya êla Qureyşiyan re nakokî zêde dibin. Di encama van nakokiyan de, Hz. Mihemed koçberî Medîneyê dibe. Di dema ku li Medîneyê bû, bi Mekiyan re sê şeran (Şerê Bedir 624, şerê Uhud 625 û şerê Xendeqê 627) dike. Di sala 630`î de Meke tê vekirin.

## Mercên Derketina Islamê:

Dema ku Hz. Mihemed ji dayîk bûyî, sê imperatoriyên bi navê Bîzans, Sasan û Hebeşistanê bandora wan li Nîvgirava Erebistanê hebûn. Cihû belavî hemû aliyên nîvgiravê bûbûn û sûd ji bazirganiyê digirtin.

Di nava van her sê imperatoriyan de, Erebistana ku Meke navenda wê bû, bazirganî dikir û bazareke navendî (lê dihatin gel hev, kirîn û firotin dikirin) ya hozên ereban bû. Weke ku Çemê Nîlê çavkaniya şaristaniya Misrê bû û Çemên Dicle û Feratê çavkaniyên şaristaniya Someran bû, bi heman wateyê bazirganî jî çavkaniya islamê bû.




Meke cihekî ku Xiristiyanîtî, Cihûtî û pirxwedaperestiyê lê jiyaye, bi şêweyê konfedrasiyona êlan dihat birêvebirin, karekterê konfedrasyonê wan xwediyê kerekterekî koledariyê bû.

Di Mekeyê de nasnameya her hozekê hebû; zêdetirî 360 pûtên cur bi cur hebûn, ji wan sê pûtên mezin ên bi navê Lat, Menat û Ûza hebûn. Vê rewşê taybetiyên birêveberî û hiyerarşiya Sumeran diyar dikir. Hz. Mihemed ji bo tunekirina vê sîstemê û qedexekirina wê, şoreşa herî mezin ya rawanî pêk anî. Piştre ji hozên ereban bingehê dewletê ava kir.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1.** Bersiva rast hilbijêre:

**a)** Hz. Mihemed ji malbata:

- Haşimiyên bazirgan e
- Sufiyan e
- Umeya ye

**b)** Hz. Mihemed piştî zewaca wî bi Xedîce re, cihê xwe di nava çîna:

- Jêr de digire
- Navîn de digire
- Jor de digire

**2.** Rewşa Erebistanê beriya islamê, binirxîne.

**WANE 2**

## FELSEFA HZ. MIHEMED

Hz. Mihemed ji bo ku şoreşa islamê li pêş bixe li ser pir milan (milê civakî, ramyarî û leşkerî) dixebite.

Mîna Hz. Îsa,  koleyan û jinan nêzî xwe dibîne. Di pêvajoya ku Hz. Mihemed di Medîneyê de bû, gihîşt hêzeke ramyarî ku di mizgefta Medîneyê de pirsgirêkên civakî gotûbêj bike. Di civakê de her kesî, di  mijarên bingehîn de, nêrînên xwe diyar dikirin û yên ku şaş derdiketin lêpirsîn ji wan dibûn. Civîn bi şêweyekî demokratîk bûn ku Jin, kole, hemû netew û komên etnîk tev li wê dibûn. Jinan li gel mêran bi hev re nimêj dikirin. Diyar e ku di destpêkê de şovenîzma rêgezperestî û neteweperestiyê tune bû. Cudahî di navbera çîn û hozan de tune bû. Her wiha, gelek biryarên ku bêdadiyê ji holê radikin, hatin girtin. Islama ku di rewşa derketinê de bû, ji demokrasî û dadweriya civakî re vekirî bû. Jixwe dema ku ev tevlîbûna demokratîk nebe, ne gengaz bû ku ew qas hoz, xizan û çîna navîn, di cih de bikevin tevgerê.

Ji milê leşkerî ve islam, oleke ku di demeke kurt de, impertoriyeke berfireh damezrandiye û di 30-40 salî de, karîbû imperatoriyên hezarsalî li bin bixe.

Hz. Mihemed di jiyana xwe de, hemû derdor û hoz xistin bin çavdêriyê. Şerkirina li hemberî hêzên mezin, sînordarkirina wan, berfirehkirina qadên ku ol lê belav bibe ji xwe re kirin armanc. Bi vê armancê li beramberî imperatoriya Bîzansê dest bi êrîşan kir. Hz. Mihemed, di rojên xwe yên dawî de bi vê armancê artêşek di bin fermandariya Usama Bin Zeyd de şand ser artêşên Bîzansê yên ku di axa Sûriyeyê de bûn. Lê ji ber ku Hz. Mihemed koça dawî kir, bêyî ku şer çêbibe, ev artêş bi paş de vegeriya. Piştî mirina wî, di dema çar xelîfeyan de dest bi

şerên fetihê kirin. Di nava van fetihan de Xenîmet bi dest xistin. Piştre islam ji rewşa rawanî derbasî rewşa leşkerî dibe. Ev yek bû destpêka ji Islama pêximber dûrketin û her ku dem bi ser de çû ev dûrketin gurtir û zêdetir bû.

## Dema Her Çar Xelîfeyan:

Hz. Mihemed piştî xwe tu kes nîşan nekiribû ji bo xelîfetiyê. Dema ku wî jiyan dikir ev nebibû pirsgirêk di nava misilmanan de lê bi mirina wî vê pirsgirêkê dest pê kir. Dema ku Hz. Mihemed jiyana xwe ji dest dide, hîn termê wî li erdê bû di nava misilmanan de şerê xelîfetiyê çêdibe û mislman dibin çar beş. Beşek erîstokrat û zengînên Mekayê ne ev beş li derdora Hz. Ebûbekir û Hz. Umer kom dibin, beşek çîna navîne ew jî li derdora Hz. Elî kom dibin, beşek jî li derdora hevjîna pêximber Aîşe kom dibin û beşê herî dawî yên ku xwe ji desthiladariyê dûr dixin ew jî Xaricî ne. Ji vî şerî desthiladariyê Ebûbekir serkeftî derdikeve. Bi vî awayî Hz. Ebûbekir (632-634) dibe xelîfeyê islamê. Hz. Ebûbekir yekemîn xelîfeyê ku  hatiye ser kar û bi awayekî xwezayî miriye.

Piştî wî, Hz. Umer (634-644) dibe xelîfe. Di vê demê de bi şer û pevçûnên dijwar û rijandina xwînê pir zêde dibe bi navê fetihê pir cih têne dagirkirin, Kurdistan jî yek ji van cihan e.

Ji bo ku Hz. Osman bibe xelîfe, ji aliyê Hz. Umer ve encumenek şêwirdariyê tê avakirin û ji aliyê wê encumenê ve Osman wek xelîfe,  tê dayîn. Hz. Osman di navbera salên (644-656) dibe xelîfe. Di vê demê de di bin navê fethê de dagirkerî li pêş ketiye. Erîstokratiyê di vê demê de cihê xwe di nava dewletê de girtiye, malbata Emewiyan bingehê desthilatdariya xwe xurt kirine.

Piştî Hz. Osman, Hz. Elî di navbera salên (656-661) de dibe xelîfeyê islamê yê çarem û di dema wî de li ser desthilatdariya islamê nakokî kûrtir bûn û ev nakokî bûn bingehê şerên

navxweyî. Di şerê Cemel û Sifînê de bi hezarên misilman hev û du kuştin û di encama şer de civaka misilmanan parçe bû.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1.** Hz. Mihemed, kê nêzî xwe dibîne?

**2.** Rola mizgeftê ya di dema Hz. Mihemed de, çi bû?

**3.** Ji milê leşgerî ve, islamê binerxîne.

**WANE 3**

## DERBASBÛNA ISLAMÊ YA NAVA KURDISTANÊ

Yekemîn êrîşên islamê, li ser Bîzans, Sasan û Misrê bûn. Nasîna kurdan a islamê, rastî van salan tê; kurd di sala 633`an de cara yekem bi islamê re rastî hev tên, di dema Hz. Umer de ji sê aliyan ve êrîşên derveyî hatine destpêkirin. Artêşa di bin fermandariya Umer Ibnullas de, ber bi Misrê ve derket û du artêş li ser xaka Kurdistanê dest bi şer kirin.

### 1. Artêşa di bin fermandariya Xalid Bin Elwelîd de:

Ev artêş ber bi Bîzans û Kurdistanê ve diçe. Di şerê Yermûkê yê di 636'an de, Bîzansê bi bin dixe. Piştî vî şerî, Sûriye û Bakurê Kurdistanê tê dagirkirin. Fermandarên Xalid Bin Elwelîd heremên: Dîlok, Gimgim, Meletî, Semsûr, Xarpût û Çewlikê dagir kirin. Artêşa di bin fermandariya Xalid Bin Elwelîd de jî heremên: Mûsil, Zaxo, Colemêrg, Wan, Mêrdîn, Amed û Sêrtê dagir kir. Ketina islamê ya nav Kurdistanê pir bi astengî û bi êş çêbûye. Bi taybetî, nêzîkatiyên islamê yên desthilatdar, ên weke dagirkerî û mêtingeriyê, bûne xalên bingehîn ên vê êşê. Ji bo nixumandina van talanî û dagirkeriyan, têgeha cîhadê bikar dianîn.

### 2. Artêşa di bin fermandariya Saad Bin Ebî Weqas de:

Ev artêş ber bi Sasan, Rojhilat û Başûrê Kurdistanê ve êrîş dan destpêkirin û di sala 636`an de, li Qadiseyê bi artêşên Sasanan re tên beramberî hev, di vî şerî de Sasan bi bin dikevin. Piştre, di sala 642`yan de di şerê navendî de, Sasan dîsa bi bin dikevin û dewleta Sasanan hildiweşe. Piştî vî şerî, tevahiya erdên Sasanan dikevin nava sînorên dewleta islamê. Rojhilat û Başûrê Kurdistanê jî, ji aliyê artêşên islamê ve tên dagirkirin.

- ❖ Kurdan islam bi yek şêwazî pêşwazî nekirine; li her herêmekê bi rengên cuda cuda islam pêşwazî kirine:
  1. Herêmên çiyayî radest nebûne û li ber xwe dane mîna Zeredeştî, Êzîdiyan, Yarîsanî, kakayî û hwd.
  2. Herêmên deştê jî li ber xwe nedane û neçar mane ku islamê bipejirînin.
  3. Hinek herêman jî piştî ku bi sedsalan şer kirine, islam pejirandine.

Bi vî awayî li beramberî islamê bertekên cuda derketine.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Artêşa Xalid Bin Elwelîd li Kurdistanê, çi herêm bi dest xistin?


2. Sasan çawa bi bin dikevin?

3. Awayê berxwedana gelê kurd li hember derbasbûna islamê ya nava Kurdistanê, binirxîne.

## WANE 4

### ISLAMA DIJBER Û SERDEMA EMEWÎ (661-750)

Emewî, xanedaneke ku piştî çar xelîfeyan bûne desthilatê dewleta erebên misilman, piştî kuştina Hz. Elî, di sala 661'ê de, Emewî tên ser desthilatdariyê. Di dema Emewiyan de sînorên dewleta islamê li rojhilat, ava Seyhûn, li rojava jî heya Okyanûsa Atlasê, li Bakur jî heta Çiyayên Pîrenan û tevahî Rojhilata Navînê berfireh dibe. Islam, ji rewanî zêdetir, bi heyberî ve dihat pêş. Li gorî Hz. Mihemed xelîfetî diyar nekiribû lê ev yek di dema Emewiyan de hate guhertin êdî xelîfetî weke çandekê ji bav derbasî kur dibe.




Piştî mirina Hz Elî, Mûawiye bûye xelîfe. Ji ber ku kurê Hz. Elî, ango Hz. Hesen ketiye nava tevgerekê Mûawiye ne zêde rihet e. Ji ber vê jî, di navbera misilmanan de şerekî nû yê navxweyî rû dide. Ji ber ku Hz. Hesen nedixwest di navbera misilmanan de şer derkeve, hin şert û merc dan pêşiya Mûawiye û xwe ji şer bi paş ve kişand. Li gorî wan mercan, dema Mûawiye bimire, cihê wî birayê Hz. Hesen, Hz. Huseyin wê bibûya xelîfe. Mûawiye ev daxwaza wan pejirand lê piştî mirina Mûawiye kurê wî Yezîd ev peyman pêk nanî û di navbera wan de şerekî navxweyî li pêş ket. Di encamê de Hz.Huseyin hat kuştin û desthilatdariya islamê di nava malbata Emewî de ma.

## Pêşketina islama dijber:

Serdema Emewiyan şoreşeke dijber e; ev dem, dema ku islam ji naveroka xwe ya civakî hat dûrxistin, li şûna islama çandî û civakî, islama desthilatdar û serdest bingeh tê girtin. Serdema Emewî, serdema herî zêde ya ku nijadperestiya ereb û pişaftin hatiye pêkanîn. Ew pişaftin bi awayekî dijwar dihat birêvebirin. Erebên misilman û misilmanên ne ereb, ji hev cuda dikirin. Bi vî rengî çînayetiyê pêş dixin , Erebên misilman bûn serdest û Erebên ne misilman jî bûne bindest. Ji beşên misilman û ne ereb re digotin: Mewalî. Bi çavekî biçûk li vî beşî dinêrîn. Ev sedem wê bibin bingehê hilweşîna dewleta Emewî.

Ji encama ramyariya erebkirinê, zimanê erebî bû zimanê fermî û yekane yê dewletê. Aboriya  dewletê bi bacên ku ji bac û xûkan (xerac û cizyê) tên û ji talanên ku di encama fetih û cihgirtinê de dihatin bidestxistin.

## Êrîşên Emewiyan  ên li ser Kurdistanê:

Ji ber ramyariya Emewî ya ku li ser bingehê parastina berjewendiyên çîna desthilattdar ava bûye, kurd jî weke hemû netewên din ên di bin desthilatdariya islama Emewiyan de, gelek êş kişandin. Ji ber cihê Kurdistanê yê stratejîk û herêmên derdora wê, Emewiyan gelek êrîşên mezin anîne ser tevahiya Kurdistanê û herêmên Bakurê Kurdistanê bi tevahî hatine dagirkirin.

Di sala 708`an de parêzgerê Emewî yê bi navê Hecac ê ku bi xwînrijiyê dihat nasîn, mêrên ku destên wan karibe şûr bigire, hemûyan dikuje, zarok û jinan jî, dike para talanê.

Xanedaniya Emewiyan di sala 750`yî de, ji aliyê Ebû Mislimê Xuresanî ve hat rûxandin, li cihê wan Ebu Elebas Elsefah

(xwînrij) dibe xelîfeyê yekem ê Ebasiyan. Bi vî awayî dewleta Ebasiyan tê damezrandin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1.** Sînorên dewleta Emewî, diyar bike?

**2.** Çima ji dema Emewiyan re, islama dijber tê gotin?

**3.** Kiryarên parêzgerê Emewî (Hecac) li ser Kurdistanê çawa bûn?

**4.** Hilweşandina xanedana Emewiyan, lêkolîn bike.

**WANE 5**

## SERDEMA EBASIYAN (750-1258)

Emewî, ji ber xwedî dewleteke zordar û klasîk bûn, ji aliyê her beşê civakê ve rastî nerazîbûn û bertekên mezin hatin. Herî zêde jî civakên mewlaliyan yên ku li Iraq û Îranê dijiyan, nerazîbûn nîşan didan.

Li rex berxwedaniya gelan, beşek ji misilmanên Ereban jî dixwestin xelîfetî ji malbata pêxember re bê dayîn, bi taybetî, piştî kuştina Hz. Huseyn, malbata Ebasî hewl didan xelîfetiyê ji destê Emewiyan derxînin, bi vî awayî bertekên civakên din û têkoşîna desthilatdariya Ebasiyan dibin yek û di encama wê de dawî li desthilatdariya Emewiyan bîne.


Ebasiyên ku li bajarê Bexdayê desthilatdariya xwe ava dikin, ji bilî Endelûsê li ser tevahî cîhana islamî, bûne desthilatdar.




Desthilatdariya Ebasiyan ji aliyê 37 Xelîfeyan ve hatiye birêvebirin. Yekemîn daxwaza wan, dewletê bi hêz bikin. Ev yek jî pêk hat, lê bi demê re her ku hêza dewletê lewaz dibe, hêza Xelîfe û serweriya Ebasiyan jî, lewaz dibe. Gelek dewletên serbixwe yên weke Karhanî, Fatimî û Bûweyhî derdikevin holê.

Di encamê de di sala 945`an de paytexta Ebasiyan Bexdê, ji aliyê Bûweyhiyan ve hat dagirkirin. Xanedana Ebasiyan hat hilweşandin, lê ji ber bandorên olî û ramyarî, destûr hat dayîn ku xelîfetî ji Ebasiyan re bimîne. Xelîfetiya Ebasiyan heya salên 1258`an berdewam dike û li ser destê Mexolan têk diçe.

## Rola Ebû Muslimê Xoresanî di avakirina dewleta Ebasiyan de:


**Ebû Muslimê Xoresanî**

Ebû Muslim, di têkçûna xanedaniya Emewiyan de xwedî kedeke mezin e. Ebû Muslim, li Kurdistan û Rojhilata Navînê kesayeteke girîng û bi hêz bû. Weke hêvî û pêşengê gelan derdikeve ser dika dîrokê. Ebû Muslim di sala 718`an de li Xorasanê ji dayîk dibe û li Kûfayê mezin dibe. Wê demê, Kûfe, cihekî bi tevgerên xwe yên ramyarî yên li dijî Emewiyan navdar bû. Ji ber vê sedemê, weke dijberekî Emewiyan mezin bû. Ebû Muslim di demeke kin de, li Rojhilata navînê bû kesayetekî nimûnyî ku pir jê tê hezkirin. Bi taybetî, piştî salên 745`an, Ebû Muslimê Xorasanî li dijî Emewiyan dest bi bangeşiyê dike. Tevgera Ebû Muslim ji Xoresanê heya Erzrûmê belav dibe û di vê serhildanê de kurd, azerî û Pers jî cihên xwe, digirin.

Emewî ji pêşketinên li Xorasanê agahdar in û dikevin tevgerê. Dibêjin herî kêm hevalbendî û yekîtiya ereban çêbikin û bi hev re tev bigerin, lê belê, tu encam negirtin. Ji ber ku Ebû Muslim dikeve tevgerê, bajaran yek bi yek digire û di herêmê de serdest dibe. Yekîneyên Emewiyan ên ku bi ser wan de dişînin, têk diçin. Bi vê binketinê re desthilatdariya Emewiyan li Xorasanê bi tevahî ji holê radibe û serdestiya Ebasiyan, ava dibe. Ebû

Elebas Elsefah xelîfetiyê digire. Ebû Muslim jî, li Xorasanê ji bo avakirina rêxistinê ji nû ve weke parêzger tê erkdarkirin. Bandor û hêza wî ya li heremê her ku diçe, zêde dibe. Ev jî dibe sedem ku birêveberiya Ebasiyan jê biguman û nerazî bin. Ebû Cehferê Mensûr nerehet dijiya; dizanîbû ku Ebû Muslim hêviya hemû kesên ku hatine perçiqandin û kesayetekî pir bi hêz e û ev rewş li pêşiya desthilatdariyê astengiyeke mezin e. Ji bo wê, Ebû Muslim bi xapandinekê vedixwînin Bexdê, li vir bi komployekê Ebû Muslim dikujin. Di heman demê de wan kesên nêzî wî jî, bi dar ve dikin. Di dîrokê de ji tevgera Ebû Muslimê Xoresanî re"tevgera feqîran" tê gotin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1.** Desthilatdariya Emewiyan bi çi awayî ji holê tê rakirin?

**2.** Ebû Muslimê Xorasanî, kesayeteke çawa bû?

**3.** Xelîfetiya Bexdê, çima û bi kîjan rêbazî Ebû Muslim dan kuştin?

**WANE 6**

## LI ROJHILATA NAVÎN PÊŞKETINA HIZIR Û DOGMATÎZMA OLÎ

Dogmatîzim: Qalibûyîn, rawestîna hizir û nepejrandina ramanên nû ye.

Dema Ebasiyan weke pêvajoya temambûna şaristaniya Islamê dihat binavkirin. gelek hewildan, gavavêtin û tevgerên felsefî derketin holê da ku Islamê di reformê re derbas bikin. Farabî, Ibn Sîna, Elrazî, Ibnruşd û hwd, di rêya felsefeyê de bîrkarî, endezyarî û bijîşkî li pêş xistibûn. Tevgera Elmutazîle bi zanist û ramanê ve mijûl dibû. Elmutezîleyan digotin:"Bi raman û mejiyê xwe, mirov dikare rastiyê û çewtiyê ji hev û du derxîne". Em ji ramanên Elmutezîleyê mînakekê bidin, dibêjin:" Xweda mirov çêkiriye, lê jê û şûnde mirov berpirsyarê kiryarê xwe ye". Ji ber ku mirov ne berpirsyarê kiryarê xwe be, ev tê wateya ku rola mejiyê mirov tune ye. Ji aliyê xweda ve bernameya mirov tê diyarkirin; baş yan jî xerab, li ser eniya wî hatiye nivsîn, wê çaxê ev mirov xerabiyê dike?! Dema ku xerabiyê dike, wê demê xweda jê re gotiye xerabiyê bike? Heger xweda jê re gotiye xerabiyê bike, çima jê hesab dixwaze? Ev tevger dibêje: Divê em gunehên xwe nekin stûyê xweda. Bi mejî em ê rastiyê û xerabiyê ji hev û du nas bikin. Bi biryara xwe em ê tev li wê bibin. Xweda em çêkirine, lê jê û şûnde divê mirov li xweda zêde tiştan nede barkirin. Lê Îmamê Xezalî ew tev weke xwedênenas bi nav kirin û xwestiye ku bîrdoziya fermî ya



**Xezalî**

dewletê bike desthilatdar. Farabî û Ibn Sîna bi xwedênenasiyê tewenbar kirin. Her wiha Ibnruşd ji ber ku ev nêzîkatî, nepejirandiye, pirtûkên wî hatin şewtandin û bi her cureyên zext û îşkenceyê re, rû bi rû maye.

Îmamê Xezalî dixwest van nêzîkbûnan bi guftûgo, lêpirsîn û rexneyan, asteng bike. Dixwest rêbaza ramanê ya li ser bingehê ragihandinê, ne ya li ser bingehê lêkolîn û mejî bi kar bîne. Gotinaên wî yên herî balkêş, ev in:

" Ê ku bi vacê (mentiq) biaxive ew ji rêya xweda, der dikeve ". her wiha dibêje: " xweda tiştên herî baş û ji bo mirovan pêwîst nivîsandiye, tiştên ku di quranê de nehatiye nivîsandin pêximber bi suneta xwe ji me re gotiye. Her wiha tiştên ku di sunetê de tune ne zaniyaran bi ictîhadê ravekirine, êdî tiştê ku mirov nizanibe nemaye. Ji ber vê yekê pêwîstiya mirov bi ictîhadê nemaye, lê belê divê mirov tenê bêk bîne". Bi vî rêbazî deriyê ictîhadê jî digre.

Şaristaniya islamê ji sedsala 12'an û pê de ji hundir ve ji ber girtina deriyên hizirê û ji derve jî, ji ber êrîşên Moxol û Xaçperestan, ketiye pêvajoyeke rawestîn û lipaşketinê. Êdî nayê rewşa xwe ya berê û wê felsefe û zanist li hemberî dogmatîzma olî têk biçin. Deriyên ramanê bi temamî tên girtin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Dogmatîzimê, pênase bike.
2. Li gorî Elmutezîle başî û xerabî di destên kê de ne?
3. Îmamê Xezalî çawa li hewildanên felsefî dinêrî?
4. Sedemên paşdemayîna Rojhilata Navînê, lêkolîn bike

**WANE 7**

## TEVGERÊN LI DIJÎ ISLAMA DIJBER (1)

Dema ku islam hat Kurdistanê, kurdan xweradest nekirin; hinek ji wan, demekê şer kirin û xwe radest kirin, hinek ji wan qet radest nebûn û hinek ji wan, rêbazên xwe guhertin û berxwedana xwe berdewam kirin. Gelek awayên berxwedanê li hemberî deshilatdariya islamê li pêş ketin. Çend ji wan awayên bingehîn jî, ev in:

### 1. Huremî:

Tevgera Huremî xwe wekî şopdarê Zerdeştî, Manîtî û Mazdekiyê da naskirin. Jina bi navê Hurem pêşengiya vê tevgerê dike. Navê tevgera wan Huremdîn (ola xweşik) e.

Di sedsala 8`an de piştî serhildana Ebû Muslimê Xoresanî, li Rojhilatê Kurdistanê derdikeve.

Tevgera Huremî tevgereke komînal e û wekheviya jin û mêr diparêze. Lê piştre vediguhere tekoşîna çekdarî. Weke sembol, cilên sor li xwe dikin û serê xwe bi şaşikên sor girê didin. Ev tevger nêzî 5 salan dewam dike û piştî wê ji aliyê Ebasiyan ve tê hilweşandin.

### 2. Babek:

Di sedsala 9`an de careke din bi pêşengtiya Babekê Huremî xwe bi rêxistin kirin û li hember Ebasiyan serî hildan. Babek Kurd bû, lê dayîka wî Azer bû. Bi dirêjahiya 22 salan li hemberî Ebasiyan şer dike. Bi hatina Babek re, Huremî di demeke kurt de di rêjeyeke girîng de mezin dibin. Babekan Keleha Bezê ji xwe re kirin navend.



**Babek**

Xelîfeyê Ebasî El Meamûn artêş  bi dû artêşê de, bi ser tevgera Babekê de dişand, lê hemû hewildanên wî vala der ketin. Heya mirina wî Babek jê re bibû kulek.

Mutesim ji bo çewisandina vê tevgerê hemû hêza xwe ji bo vî şerî, bi kar tîne. Kesekî bi navê Efşîn ku turk e , dibe serleşkerê artêşê. Efşîn hemû hêza di destên xwe de bi rêbazên pir hovane, bi kar tîne. Bi hezaran mirov, bêyî ku cudahî bixe nava zayend û temenê wan de, dikuje. Serhildana Babekê ku li hemberî Ebasiyan lewaz dibe, bi ketina Keleha Bezê, di sala 837`an de serhildan têk diçe. Her çi qas Babek çembera êrîşê diqetîne û li herêma Serhedê xwest hêza xwe dîsa komî ser hev bike, lê dîl tê girtin û radestî Ebasiyan tê kirin. Di sala 838`an de bi rengekî hovane tê kuştin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1.** Huremî tevgereke çawa bû û çi nirx diparast?

**2.** Serhildana Babekê li hember Ebasiyan çend salan berdewam kiriye?

**3.** Ji bo têkbirina tevgera Babekê, Xelîfe Mutesim çi dike?

**WANE 8**

## TEVGERÊN LI DIJÎ ISLAMA DIJBER (2)

### 1. Yarîsan:

Ji xwe re **Ehlulheq** jî dibêjin; ango gelê rastiyê yan jî mirovê rast. Yarîsan tê wateya civaka dost.



Li ser bingehê parastina çanda Zerdeştî, wekî helwestekê li dijî islama dijber, di sedsala heftem de li pêş dikeve.

Yarîsanî bi rêya mûzîkê perestinê dikin û li gel wan veguhestina giyanan heye. Jin di nav wan de pîroz e. Jin di nava civakê de, hem di birêveberiya civakî de, hem jî di birêveberiya olê de cih digire. Heya roja îro jî ev bawerî li Rohilatê Kurdistanê berdewam dike û di nava kurdan de şaxekî herî bihêz yê ku li hember islama dijber, li ber xwe dide. Gelek dîroknasên kurd, Yarîsaniyan weke pêşengê wêjeya kurdî digirin dest. Heman dîroknas dibêjin ku “Eger Yarîsanî nebana wêjeya kurdî wê ew qasî pêşneketiba”. Pêşengên ola Yarîsaniyan Pîr Şalyar û Behlûlê Mahî ne.

## 2. Qarmatî:

Ev tevger di sedsala 9`an de li pêş dikeve. Serokê wê Hemdan Eleşes e yê ku bi bejina xwe ya kin dihat nasîn, ji bo vê yekê Qurmit jê re dihat gotin. Tevgereke komînal e, li ser bingehê wekheviyê ava bûye û li dijî du tiştan derketiye:

- Rûxandina pergala ramyarî di imperatoriya Ebasiyan de.
- Tunebûna dadweriya civakî di sîstema Ebasî de.

Li hemberî imperatoriya Ebasiyan şer dikin û li gelek cihan bandora wan çêdibe. Di bingehê xwe de li Behrên û piştre li hemû welatên kendavê belav bûn. Di heman demê, nêzî 30 salî li welatên Şamê û beşeke ji Iraqê jî serwerî kirine. Lê reşkirina ku li dijî wan hat kirin û êrîşên tund ên imperatoriya Ebasiyan, bi alîkariya turkan, bû sedema têkçûna tevgera Qarmatiyê.

## 3. Tevgera Zincî:

Ev tevger bi pêşengtiya Elî kurê Mihemed ê ku bi koka xwe Pers e, li Besrayê di sala 869`an dest pê kiriye û bi dirêjahiya 14 salan domandiye. Armanca wê ku stemkariya li ser koleyan dihat meşandin, ji holê rake. Endamên wê bi piranî ji koleyên reş bûn, lewra navê wê tevgera Zinciyan e (ji ber ku ev kole di dema surgunkirinê de zincîr dixistin stûyê wan, lewre ev nav li wan hat kirin). Li hember desthilatdariya Ebasiyan serî hildan û di gelek şeran de, tevî hejmara wan a kêm bi ser ketin û sînorê xwe berfireh kirin.

Vê rewşê dewleta Ebasî xiste metirsiyê. Ji bo têkbirina wan alîkariya Fatimiyan xwestin û bi artêşeke mezin bi ser tevgerê de çûn. Di encamê de zêdetirî 250 hezar mirov hatin kuştin. Ji destpêka vê tevgerê heta jiholêrakirina wê zêdetirî 14 salan birêveberiyeke komînal di herêmê de dan meşandin.

## PIRSÊN NRIXANDINÊ

1. Yarîsanî tê çi wateyê û kîjan bawerî bingeh girtine?

2. Tevgera Qarmatî li dij çi derket?


3. Tevgera zincî li ku derê û ji bo çi derket?

## WANE 9

### MÎRNIŞÎNÊN KURD ÊN DI DEMA ISLAMÊ DE (1)


### 1. BUWEYHÎ:

Li ser bingehê şîatiyê hatiye avakirin. Ji sala 932`an heta 1055`an desthilatiya xwe domandiye. Yê ku navê xwe dayî vê xanedaniyê **Ebû Şûcayê Buweyh** e. Kurên wî Elî, Hesen û Ehmed li Îran, Xorasan û tevahiya Mezopotamyayê sê mîrnişînên cuda ava kirine. Dema Ebû Duweyle mîrnişînê dike yek, dema zêrîn e. Piştî mirina wî, dîsa hatiye parçekirin. Di dema yekirinê de Bexdê hatiye stendin û xelîfeyê Ebasî bi giştî êdî di bin bandora Buweyhan de ye. Dema welat tê parçekirin, beşên Îran û Xorasanê ji aliyê Xeznewiyan ve, tê hilweşandin. Beşa Mezopotamyayê jî ji aliyê xelîfeyê Ebasî ve, bi alîkariya Selçûqiyan (ên ku di bin desthilatiya Tûxrûl Bey de ne), di sala 1055`an de hatiye rûxandin.



## 2. MERWANÎ (DOSTEKÎ):

Damezrînerê mîrnişîna Merwaniyan **Baz kûrê Dostik** e. Baz li dijî deshilatdariya Hemdanan serhildan da despêkirin. Di vê serhildanê de gelê kurd, li herêma Amed û Meyafarqînê li rex Baz cih girtin. Bajarê Meyafarqînê ku navendek girîng a dewleta Hemdanê bû, ji wan hat standin. Piştî girtina bajarê Meyafarqînê, artêşên ji Helebê ji bo şkenandina Baz, ji aliyê birêveberên Hemdaniyan ve hatin şandin, lê bi ser neketin. Têkçûna Hemdaniyan bû sedema jidestçûyîna bajarê Amedê jî. Bi vî awayî her ku çû deshilatdariya Baz belavî herêmê bû. Di demeke kin de herêmên Riha, Amed, Xerpût heya Cizîr û Nisêbînê jî, di nava sînorên mîrnişîna Merwaniyan de, cih girtin. Serkeftinên Baz, birêveberiya Hemdanê û xelîfeyê Bexdê jî ditirsand. Ji ber vê sedemê hêzên Ebasî û Hemdanî bi hev re êrîşî welatê Baz kirin. Baz ji bo parastina welatê xwe berxwedaneke binirx da nîşandan.  Di vî şerî de jiyana xwe ji dest da. Dema Baz hat kuştin, xwarziyê wî yê mezin **Hesenê Kûrê Merwan** gelê kurd li derdora xwe kom kir, dijminê xwe şopand û piraniya wan kuştin. Piştî vê bûyerê çû Hesenkeyfê û ji wir jî berê xwe da Meyafarqînê. Li vê derê di sala 991`ê de birêveberiya xwe da diyarkirin. Bi vî awayî birêveberî ket destê Merwaniyan. Lê di sala 1011`an de tê jehrkirin. **Ebû Nasir kurê Merwan** ê ku ew jehir kiribû, tê ser text. Ebû Nasir 40 salî fermandariya xwe didomîne.  Girêdana xwe ya bi xelîfeyê Ebasî re diyar dike; li ser navê xelîfe pereyan çap dike û salane bacê dide. Kurê Ebû Nasir, **Mensûr** tê cihê bavê xwe.



## Lewazbûn û Hilweşîna Mîrnişîna Merwanî:

Tevî ku Mensûr, di şerê Melazgirê de destek dabû Elb Erselan sultanê Selcûqî, li dijî Bîzansan, lê dewlemendî û jiyana pêşketî ya mîrnişîna Merwaniyan, bala birêveberên Selçûqî dikişand. Ji bo dagirkirina herêmên di bin destên Merwaniyan de, wezîrê imperatoriya Selçûqê Nizamûlmûlk ketibû tevgerê.



**Pira Meyafarqînê**

Mîrnişîna Merwaniyan di sala 1086`an de bi êrîşeke mezin a Selçûqiyan re rû be rû ma. Di vê salê de, Amed û Meyafarqîn hatin dorpêçkirin. Dorpêçkirina wan a her du bajaran, salekê berdewam kir. Di sala 1087`an de li derdora Amedê şerekî mezin pêk hat. Di encama vî şerî de bajarê Amedê ket destê Selçûqan. Bi ketina Amedê re, bajarên din yên Merwaniyan jî yek bi yek ketin destê Selçûqiyan.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Dema zêrîn ya mîrnişîna Bueyhî kengî bû û çi serkeftin di wê de çê bûn?

2. Kî mîrnişîna Merwanî ava dike û li dij desthilatdariya kê radibe?

3. Ebû Nasir, çawa tê ser desthilatdariyê û çi dike?

4. Çawa mîrnişîna Merwanî tê helwişandin?

WANE 10

# MÎRNIŞÎNÊN KURD ÊN DI DEMA ISLAMÊ DE (2)

## 1. ŞEDADÎ:

**Mihemed Şedadî** yê ku ji êla Rewandiyan bû, di sala 951`ê de, vê mîrnişînê dadimezrîne. Selehedînê Eyûbî jî ,ji êla Rewandiyan bû.



Dêra Enî

Şedadiyan, qasê sed salî welatê xwe bi rengekî serkeftî bi rê ve birin. Bermayên dîrokî yên ji vê demê mane pêşketin û dewlemendiya vê mîrnişîna kurd, destnîşan dike. Birêveberên Şedadiyan, girîngiyek mezin didan hozanvan, nivîskar û mirovên zana.

Mîrnişîna Şedadiyan jî piştî demekê, weke mîrnişînên din yên Kurdistanê rastî êrîşên Selçûqan hatin. Di sala 1064`an de Sultanê Selçûqî, Melikşah êrîşî welatê Şedadiyan dike û dawî li deshilatdariya wan tîne. Lê tê xuyakirin ku heya demekê  ew girêdayî Selçûqiyan mane û di welatê xwe de birêveberî meşandine.

## 2. EYÛBÎ:

Ji aliyê fermandarê mezin ê kurd **Selahedînê Eyûbî** ve, tê avakirin. Selahedînê Eyûbî di sala 1138`an de li Tekrîtê ji dayîk bûye. Bavê Selahedîn, ango Eyûb û mamê wî Şêrko di xizmeta mîrê Mûsilê, Nûredîn Zengî de bûn. Selahedîn, bi saya bav û mamê xwe, hunera birêvebirin û artêşê fêr dibe.

Selahedîn di 14 saliya xwe de tev li artêşê dibe. Piştî ku Selahedîn û mamê xwe Şêrko li Şamê demeke diyar di artêşê de xizmetê dikin, bi fermana Nûredîn Zengî weke serfermandar bi artêşekê re ber bi dewleta Fatimî ya Misrê ve bi rê dikevin. Dewleta Fatimî ji şerkirina bi vê artêşê re, ditirse, ji ber vê, rêya lihevhatinê hildibijêre. Şêrko dibe wezîrê dewleta Fatimî. Piştî demeke kurt Şêrko dimire, Selahedîn tê cihê wî. Di sala 1171`ê de Selahedîn, dawiyê li dewleta Fatimî tîne.



**Selahedînê Eyûbî**

Demekê bi navê Nûredîn Zengî desthilatdariyê bi rê ve dibe. Di sala 1174`an de, serxwebûna xwe diyar dike. Li vir, li dijî xaçperestan dikeve nava amadekariyeke mezin. Artêşekê ji hemû gelên Rojhilata Navînê (kurd, turk, pers, ereb…) ava dike. Gewdeyê bingehîn û hêza lêdanê ya artêşê ji kurdan pêk dihat. Vê artêşê, pirrê caran bi xaçperestan re şer kiriye, herî dawî bi şerê Hetînê, xaçperest rastî binketineke berçav tên û Quds tê rizgarkirin. Piştî vê rizgarkirinê Misir, Sûrye, Yemen û Iraqê dikevin bin kontrola Selahedîn. Piştî van serkeftinên Selahedînê Eyûbî, êrîşa sêyem a xaçperestan, dest pê dike. Ev êrîşa ku ji artêşên sê dewletan pêk dihat, bi bin xist û di 1193`an

de li Şamê weke fermandarê Rojhilata Navînê, tê nasîn. Selahedînê Eyûbî weke kesekî kurd ê girîng muhra xwe li dîroka cîhanê û Rojhilata Navînê dixe. Çavên xwe li Şamê, li jiyanê digire û li wê derê tê oxirkirin. Piştî mirina wî dewleta Eyûbî di nava zarokên wî de tê dabeşkirin.



## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Kî damizrînerê mîrnişîna Şedadî ye û Şedadiyan girîngî didan çi?
2. Çawa mîrnişîna Şedadî tê helwişandin?
3. Kî damezrînerê dewleta Eyûbî ye û bi koka xwe ji ku ye?
4. Şerê Selahedîn bi Xaçperestan re çawa pêk hat û kê cihê xwe di nava artêşê de digirt?
5. Herêmên ku dikevin destê Eyûbiyan de, diyar bike.

# BEŞA SÊYEM

* Êrîşên Xaçperestan
* Imperatoriya Selcûqî
* Dagirkeriya Moxolan
* Êrîşên Holako

**WANE 1**

# ÊRÎŞÊN XAÇPERESTAN

## Di dema êrîşên xaçperestan de rewşa Ewrûpa û Rojhilata navînê:

Rojhilata Navînê bi hêza xwe ya ku ji dîroka xwe digire pêngavên mezin avêtine. Di Serdema Navînê de hîna jî, Rojhilata Navînê di rewşa navenda zanist, felsefe û ronakbîriyê de ye.




Ewrûpa di vê demê de, di nava pêvajoyeke tarî de dijî. Ji dema Grek û Roma ve tu derketin pêk naniye. Di heman demê de di astengityên aborî de dijî. Ji ber vê yekê li rêyeke derketinê digere û bi êrîşkirina li ser Rojhilata Navînê, weke yekane rêya derketinê dibîne.

Ji ber ku li ser cil û mertalên leşkerên vê artêşê xaç hebûn, ji wan re xaçperest dihat gotin. Xaç nûnertiya ola xiristiyaniyê dike. Eger ol û aborî weke sedemên vê êrîşê bên nîşandan jî, lê di rastiyê de, ev şerekî şaristaniyan bû. Armanca wê xurtkirina şaristaniya navendî ya Ewrûpayê bû. Di bin sîwana xiristaniyê de û parastina ola xiristiyanî ya li Rojhilatê, ev şer pêk hatin. Nasnameya bîrdozî ya vî şerê şaristaniyan, islam û xiristiyanî

bû. Di nava salên (1095-1272) de, bi şerekî heşt êrîşên xaçperestan hatin lidarxistin.

## Encama Şerên Xaçperestan:

1. Tevî sozên serkeftin û dagirkirinê yên papa û dêrê, ev êrîş bi binketinê bi dawî bûn. Ev bû sedema kêmbawerî û girêdana bi papa û dêrê ve kêm bibe.
2. Desthilatdariya navendî ya feodalîzma Ewrûpayê, bi hêztir dibe.
3. Di encama van êrîşan de, çanda Rojhilat û Rojavayê ji hev bandor bûn.
4. Ji ber ku serpêhatiyên di qada aborî û hilberînê de ji Rojhilata Navînê hatine wergirtin, li Ewrûpayê di asteke bilind de hilberîn hatiye bidestxistin.
5. Berhemên di qada felsefe, bijîşkî, stêrnasî û fîzîkê de dibin Ewrûpayê. Vê rewşê ji bo serdema ronakbîriya Ewrûpayê, bingeh ava kiriye.

Piştî van şeran Rojhilata Navînê ket qonaxeke nû ku di paşdemayînekê de bijî. Sedemên vê paşdemayînê jî ev in:

1. Sedemên hundirîn: Qedexekirina derfetên giftûgokirina felsefî bi nûnertiya islama dijber.
2. Sedemên derveyî: Êrîşên Moxolan.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1.** Di Serdema Navînê de, rewşa Rojhilata Navînê û Ewrûpayê çawa bû? Binirxîne.

**2.** Ji ber kîjan sedeman, êrîşên Xaçperestan tên lidarxistin?

**3.** Çend encamên êrîşên xaçperestan, binivîse.

**WANE 2**

# IMPERATORIYA SELÇÛQÎ

Hozên turkan ji sedsala 7an ji asya navîn ber bi rojava ve koçber dibin. Di vê koçberiyê de rastî şaristaniya islamê tên. Di şerê Talisê de bi bin dikevin û dikevin bin bandoriya Ereban. Êdî Serokhoz û fermandarên wan islamê dipejirînin û dibin leşkerê Ebasiyan ên ku bi pereyan hatine kirîn, ji wan re koleyên spî (memlûk) tê gotin.

Lê hin ji miletê turk olên xwe yê şamanîzimê berdewam dikin û hin ji wan jî Elewîtiyê dipejirînin. Serokêl û hozên Turkan her ku diçin di nava Ebasiyan de bi bandor dibin him weke hejmar û him jî weke hêz digihêjin asteke bilind û fermandariya artêşê bi dest dixin.




Êlên Turk di bin pêşengiya Tûxrûl û Çaxrî Beg de, di sala 1040`î de, bi şerê li Dandanakanê re Xezneweyan bi bin dixin û imperatoriya Selçûqî ya mezin ava dikin. Di 1055`an de Selçûqî dikevin Bexdê û dawî li desthilatiya Buweyhiyan tînin.

## Şerê Melazgirê û Hevkariya Kurd û Turkan:

Bi hatina turkan a Rojhilata Navînê re, di herêmê de rewşeke aloz dest pê kir. turkan bi talankirina civakên herêmê jiyana xwe didomandin. Ji bo ku karibin di Rojhilata Navînê de cih bigirin,

islam ji milê ramyarî ve pejirandin. Ev ji bo wan derfetek mezin bû. Bi navê islamê heyînên civakên herêmê ji destên wan derdixistin. Vê jî, rê li ber hejariya mirovan vekir. Lê, hem misilmanbûna civakên herêmê, hem jî xurtbûna ziman û çanda wan, pêşî li daxwazên turkan ên talanker digirtin. Ji ber vê sedemê berê xwe dan herêmên di destê Bîzansan de.

Sultanê Selçûqan Alpaslan di sala 1070`yî de li ser navê xelîfeyê islamê ji bo dagirkirina herêmên di destê Bîzansan de ji Xoresanê ket rê. Turkmenên Azerbeycanê û kurdên Hemedanê jî tev li artêşa wî bûn. Bi artêşekê mezin ji bakûrê gola Wanê derbas bû û hat pêşberî Melezgirê. Piştî bajarên li vê derê dagir dike, bi Merwaniyan re li dijî Bîzansan peymanek imze kir.



**Şerê Melazgirê**

Li ser wê peymanê, artêşeke ya Merwaniyan tev li artêşa Selçûqan bû. Merwaniyan herêma Bîzansan baş nas dikirin, vê jî di dagirkirina xaka Bîzansan de, roleke girîng lîstiye.

Sedemên ku kurdan bi Selçûqan re alîkarî kirin, Selçûqan weke dijmin ne didîtin û Bîzansan jî pir caran ji jor ve kurd nerihet dikirin.

Bi vî awayî artêşên Selçûqan û Bîzansan li Melezgirê di sala 1071`ê de hatin hemberî hev. Di şer de hejmarek mezin ji turkên Oxûz û şaxek ji artêşa Romen Diyojen veqetiyan û tev li Selçûqan bûn. Vê rewşê bandoreke neyênî li Bîzansan kir.

Şerê ku di vê rewşê de dest pê kir, bi serkeftina Selçûqan bi encam bû. **Romen Diyojen** bi birîndarî ket destê Selçûqan û artêşa wî belav bû. Ev şerê ku bi alîkariya kurdan hat biserxistin, di peywendiyên her du civakan de, dibe gava yekem. Ji vî şerî û pê de deriyên Anatolê ji bo turkan vedibin. Kom bi kom turk derbasî Anatolê dibin û ev herêm dibe welatê wan. Lê Selcûqên ku îdyolojiya islama sunî ji xwe re kiribûn mertal, gelên herêmê brtek û nerazîbûnên xwe di rêya serhildanan re, li dij wan nîşan dan.

## Serhildana Baba Îshaq 1239:

Serhildaneke xwedî bingeheke civakî û olî bû. Baba Îshaq mirîdê Baba Ilyas bû. Di ramanê xwe de dibêje: "Hemû mirov weke hev in, lê hin kesan desthilatdarî di destê xwe de girtine û pêwîst e ev yek ji hole rabe". Li ser van nêzîkatiyên azad, Selcûqan Baba Ilyas avêtin zindanê. Ji bo rizgarkirina wî Baba Îshaq xizanan li derdora xwe kom dike û kesên ku Selçûqan erdên wan bi darê zorê ji wan stendibûn, tev li serhildanê dibin. Her wiha gelên Aşûr û Ermen jî tev li serhildanê dibin. Bi vî awayî, serhildan di 1239`an de dest pê dike. Serhildana Babayî li Meletî, Koçgirî, Mereş û Rihayê belav dibe û di demeke kin de Semsurê jî bi dest dixin û heta Amasyayê çûn.

Dema ku serhildan belav dibe û gelek sekeftinan bi dest dixe, Selcûqî rêbazên xapînok dimeşînin. Sozan didin xwediyê erdan ku wê erdên wan ji wan re vegerînin, heger dev ji serhildanê berdin. Li ser vê çendê dev ji serhildanê berdidin û xwe dispêrin Selcûqiyan. Lê Baba Îshaq bi leşkerên xizan serhildanê berdewam dike û gelek serkeftinnan bi dest dixe. Li hember vê yekê, Selcûqî çeteyan bi peran ji Ewrûpayê tînin. Ev çete bi

tundî bi ser serhildanê ve diçin û hemû çek û cebilxaneyên pêşketî bi kar tînîn, lewma serhildan bi bin dikeve. Baba Îshaq û Baba Ilyas serjê dikin û wan bi rojan li kelheya Emasyayê hilawestî hiştin.

Piştî ku serhildan hat şkandin û Baba Îshaq hat kuştin û bi şûn de, Babayan cardin êrîşî Qonyayê kirin, lê Selçuqan ew hewildana dawiyê jî bi komkujiyeke dijwar perçiqandin. Lê belê serhildana Babayan dewleta Selcûqî di navbera sê salan de pir ji hêz xistibû. Ji ber vê yekê, li hember êrişên Moxolan nikarîbûn zêde li ber xwe bidin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Di şerê Melazgirê de serkeftin, bi çi awayî çêdibe?


2. Encamên şerê Melazgirê, binirxîne.

3. Serhildana Baba Îshaq bi çi rêbazî tê rawestandin?

**WANE 3**

## DAGIRKERIYA MOXOLAN

Damezrînerê imperatoriya Moxolê, Cengîzxan e. Ev nav, piştî sazkirina dewletê stendiye. Navê wî yê yekem, Tîmocîn e. Imperatoriya Moxolê di navbera salên (1206-1268) de berdewam kiriye. Sînorên vê imperatoriyê, ji Kendava Besrayê heta Sîbîryayê, ji Deryaya Japonyayê heta rojhilatê Ewrûpayê dirêj bûye.




Imperatoriya Moxolan, weke mezintirîn imperatoriya sînorgirî di dîrok û cîhanê de, tê nasîn. Di heman demê de hovtirîn û çavsortirîn imperatoriya dîrokî ya cîhanê ye. Artêşa Moxolê, di jiyana Cengîzxan de tu carî bi bin neketiye û hemû welatên ku derbasî wan bûne, talan û qirkirin pêk anîne.

Rêbazê Moxolan ji yê dagirkerên din cuda ye; welatê ku li ber xwe bide, zilamên wî welatî tên kuştin, jin û pîşekar weke dîl ji Asyaya Navînê re tên şandin û ev welat tê serûbinkirin. Ger welatek li ber xwe nede, tevahiya gel derdixin derveyî bajêr, bajêr talan dikin û dest li gelê bajêr nayê dayîn. Bi van rêbazan, tirs belavî nav gelan dibe.

Cengîzxan di sala 1206`an de Moxol û hozên li Asya Navînê gihandin hev û imperatorî, ava kir. Di sala 1215`an de tevahiya Çînê dagir kiriye.

Di sala 1220`an de, beşeke mezin ji Kurdistanê dagir kirine. Bajarên weke Şarezor, Amed, Xelat û Wanê serûbin dikin û bi hezarên mirovan dikujin. Li beramberî vê talan û dagirkeriyê, kurd neçar dimînin xwe vekişînin çiyayan û yên li bajaran dijîn di bin her cure stemkarî û zextê de jiyana xwe berdewam dikin. Moxolî, tevahî pirtûkên ku bi hezarê salan kom bûne, dişewitînin.

Civakên Rojhilata Navînê, ji her cureyê pêşveçûn û pêşketinê qut dikin û dest bi pêvajoyeke tarî dikin. Vê zorê bi her awayî, jiyana zanistî û civakî rawestandiye. Vê rewşê heta sala 1410`an weke çaxa Tîmûr berdewam dike. Dema Cengîzxan dimire, imperatorî di nava kurên wî de tê parçekirin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Sînorên imperatoriya Moxolê, ji ku heta ku derê dirêj dibin?
2. Welatên ku Moxol derbasî wan dibe, ger li ber xwe bidana, çi dianîn serê wan?
3. Bi ketina Moxolan a Kurdistanê re, gel li ber stemkariya wan bi çi şêweyî dijî?

**WANE 4**

## ÊRÎŞÊN HOLAKO

Holako, neviyê Cengîzxan û damezrînerê dewleta Îlxanan e. Bi artêşeke mezin di sala 1255`an de ber bi navenda Îranê ve diçe û di demeke kurt de axa Loranê dagir kirin.



Keleha Alamûtê

Piştre, berê xwe dan Keleha Alamûtê. Keleha Alamûtê pirê caran hatiye dorpêçkirin, lê nehatiye bidestxistin. Bi çêkirina coyan û dagirtina wan bi petrolê û teqandina wê re, hat bidestxistin û hemû kesên di kelehê de tune kirin.

Piştî Keleha Alamûtê hat bidestxistin, Holako berê xwe da Bexdê. Dema ku xelîfeyê Ebasiyan Mutasim, bersiveke neyînî da û xweradestkirin nepejirand, Holako ev ji xwe re kir sedema xerabkirina Bexdê. Bexdê dagir û talan kir û xwest wê tune bike. Di sala 1258`an de Bexdê bi tevahî tê bidestxistin û hemû mirovên li wê deverê dikujin, mirov nikare texmîn bike, ku li vê deverê çend mirov hatine kuştin. Hemû pirtûkên di pirtûkxaneya bi nav û deng a Bexdê de ku navenda zanista wê demê bû, davêje çemê Dicleyê. Ev nimûneyeke mezin a hovîtiya wan e. Holako piraniya armancên xwe, pêk anî.



Holako

Lê belê, Misr hîna bi dest nexistibû. Di vê navberê de li ser desthilatdariya Moxolê jî, şer çêdibe. Holako serleşkeran li şûn xwe dihêle û vedigere Qafqasyayê. Dema ku Holako ji heremê diçe, sala 1260`î de di navbera artêşa Moxol û Memlûkiyan de, li Eyncalûtê, şer diqewime. Di encamê de artêşa Moxolan têk

diçe û xaka Filistîn û Sûryeyê ji destê wan derdikeve. Yekîtiya Moxolan, dibe çar parçe û Holako dixwaze artêşa Moxolan careke din vegerîne Rojhilata Navînê, lê Holako bi artêşên ku ji bermahiya perçebûna Moxolan mane, dikeve nava şer û di encamê de têk diçe. Di sala 1265`an de jî Holako dimire.

**Bandora dagirkeriya Maxolan a li Rojhilata navîn û Kurdistanê:**

1. Pêşveçûnên zanistî bi giştî rawestiyan.
2. Bi dehan bajar, hatin talankirin û şewitandin.
3. Hejmareke mezin ji şêniyan tên tunekirin.
4. Bi milyonan berhemên ku embara dîrokê bûn, tên tunekirin.
5. Li Kurdistanê, tevahî sazî û berhemên girêdayî kurdan, wêran bûne.
6. Di bîranînên civakan de, şopên tirsê hiştine û ev şop, demeke dirêj bi gelên Rojhilata Navînê re maye

## Tîmûrleng:

Dewleta Moxolê, Di sala 1365`an de ji aliyê Tîmûr ve hatiye avakirin. Ji ber ku lingê wî seqet e, jê re Tîmûrleng dihat gotin. Tîmûr, ji bo avakirina Dewleta Moxolê, xebitiye û heta ku miriye (1405) li ser vê rêyê maye.



**Tîmûrleng**

Sînorên dewletê, ji Hîndistanê heta Deraya Egeyê berfireh dike. Di sala 1401`ê de, Kurdistanê dagir dike û bajarên weke: Amed, Wan, Kermanşah, Sine û Zaxoyê dixe bin destên xwe û qirkirineke mezin pêk tîne. Di serê sala 1402`yan de, bajarê Sêwasê dagir dike û çi mirovê ku di bajar de bûn, hemûyan bi saxî binax dike. Kurdistan, ji nû ve bi seranserî tê şewitandin, hilweşandin û talankirin. Tîmûr di sala 1402`yan de, li Enqereyê bi Osmaniyan re şer dike û di wî şerî de bi ser dikeve. Piştî mirina Tîmûrleng dewleta wî di nava

zarokên wî de parçe dibe û di sala 1507`an de ji aliyê paşayê Ozbek ve tê hilweşandin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1.** Holako, kengî û çawa Bexdê dagir kir?

**2.** Gelo çima dagirker her dem pirtûk û berheman dişewitînin?

**3.** Encamên êrîşa Moxolan ên li ser Rojhilata Navîn û Kurdistanê, çi bûn?

**4.** Dema ku Tîmûrleng Kurdistanê dagir dike, li wê deverê çi dike?

# BEŞA ÇAREM

* Imperatoriya Osmaniyan
* Dewleta Sefewî
* Peymanên di navbera kurd û Osmaniyan de
* Peymana Idrîsê Bedlîsî û Yawûz Selîm
* Serhildanên gelan li hember Osmaniyan
* Rewşa Rojhilatê Kurdistanê di bin desthilatdariya Sefewiyan de
* Peymana Qesra Şêrîn

**WANE 1**

**IMPERATORIYA OSMANÎ**

## Osmanî kî ne?

Piştî şerê Melazgirê, turk li Anatolê bi şêweyê mîrnişînan dest bi cîhbûn û belavbûnê dikin. Her mîrnişînek li ser axa xwe birêveberiyekê saz dike. Yek ji van mîrnişînan a ku navê xwe ji Osman Beg digire, xanedana Osmaniyan bû.




Piştî mîrmişîna Osmanî li Anatolê bi cih bû û ji ber ku imberatoriya Bîzansê di wê demê de di rewşeke aloz û lewaz de bû, Osmanî ber bi axa Yewnanê ve xwe berfireh kir. Piştî ku sînorên xwe bi aliyê Bîzansan ve berfireh kir, mîrnişînên derdora xwe jî, xistin bin desthilatdariya xwe û bûn dewlet. Osmaniyên ku bi şêweyê mîrnişîn girêdayî Selçuqan bûn, di sala 1299`an de serxwebûna xwe radigihînin.

Di sala 1453`yan de, Osmaniyan paytexta Bîzansan Qestentîniya (Stenbol) dagir kirin bûn imperatorî.

## Şerên navxweyî yên Osmaniyan:

Di nava malbata Osman de, nirxên biratî, xizm, bav û kur tune bûn. Ji bo xwegihandina desthilatdariyê, hemû kiryarên nemirovî dikirin, ango yek ji wan dikarîbû malbata xwe ji bo desthilatdariyê tune bike.

Mînakên wê jî pir in, mîna: Sultan Muradê Yekem yê ku kurê xwe kuşt, ew jî, ji bo ku kurê wî li hember wî ranebe yan jî Sultan Mihemedê Sêyem yê ku ji bo parastina desthilatdariya xwe 11 birayên xwe di zarokatiya wan de fetisandin, bi heman hişmendiyê Beyazîdê Duyem bavê xwe jar kir û piştre bi destê kurê xwe bi jarê mir. Ev ji bilî kesên ku di zindanan de ji tenêtî û xemgîniyê dimirin û yên ku bi bêhişbûnê tewanbar dibûn ji bo ku wan ji dika desthilatdariyê bixin.

Ev sîstema hov di nava Osmaniyan de bû çand heta ku Mihemedê duyem fermanek ragihand ku**" Ji bo parastina yekîtiya imperatoriyê, ji mafê sultan e birayê xwe bikuje "**

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1.** Piştî şerê Melazgirê turk li Anatolê bi çi şêweyî dijiyan?

**2.** Piştî mîrnişîna Osmanî li Anatolê bi cih bû, bi çi rengî xwe berfireh kir?

**3.** Hin mînakên şerê desthildariyê yê di nava malbata Osmanî de, diyar bike.

**WANE 2**

## DEWLETA SEFEWÎ

Dewleta Sefewî, li ser axa Îranê hatiye damezrandin. Di dîrokê de Sefewî weke Pers tên nasîn. Li ser rêbaza şîatiyê hatiye avakirin. Di sala 1501`ê de ji hêla Şah Îsmaîlê Sefewî ve hatiye damezirandin. Sefawiyan bi alîkariya turkmenan di sala 1503`an de Azerbaycan desteser kirin, piştre di sala 1507`an de Amed, Riha, Mêrdîn, Heleb û heta Mûsilê tev xistin bin kontrola xwe.




Di sala 1508`an de, dawî li desthilatdariya Akoyuna jî anîn û li bakûrê Kurdistanê jî deshilatdariya xwe saz kirin. Şah Îsmaîl di sala 1507`an de Şîatiyê wekî ol û rêbaza dewletê radigihîne. Ji ber ku piraniya kurdan sunî bûn pirsgirêk derketin holê. Li ser vê yekê Şah Îsmaîl li Cizîrê û derdora wê Ermen, Kurdên Êzîdî û kurdên sunî di qirkirinên komî re derbas kir, bi deh hezaran Kurd û Ermen hatin kuştin. Ji ber tirsa ku Şah Îsmaîl li Kurdistanê belav kir, hejmarek mîr û begên kurd, xwe nêzî wî kirin, mîna mîrên Heskîf, Bedlîs, Xîzan û Sasonê da ku

girêdanên xwe bidin diyarkirin û bi Şah Îsmaîl re hevdîtinekê pêk bînin çûn Tebrîzê, di vê çûnê de Şah Îsmaîl ev mîr û begên kurd xistin zindanê

Bi vî awayî li Rojhilata Navînê du imperatorî bilind dibûn; Osmanî û Safewî. Osmaniyan di herêmê de nûnertiya islama sunî dikirin. Safewiyan jî nûnertiya islama Şîa dikirin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1.** Dewleta Sefewî ji hêla kê ve hatiye damezrandin?

**2.** Li ser destê Sefewiyan gelên kurd û ermen rastî çi hatin?

## WANE 3

## PEYMANÊN DI NAVBERA KURD Û OSMANIYAN DE


Di derdora salên 1500`î de, du hêzên sereke çêbûbûn:
**1.** Osmanî
**2.** Sefewî
Ji ber ku Osmanî ji aliyê rojava ve ji sala 1500`î û pê ve, êdî nikarin bi pêş de biçin, berê xwe dan Rojhilata Navînê û ji bo ku bikarin Rojhilata Navînê bi dest bixin, pêwîstiya wan bi kurdan hebû. Hevpeymana Çaldêran di sala 1514`an de, bi pêşengyia Idrîsê Bedlîsî çêbû. Idrîsê Bedlîsî kurdekî ji Colemêrgê bû û şêwirmendê ramyariya Sultan Selîm ê Rojhilatê bû.

Idrîsê Bedlîsî civînekê ji begên kurdan re çêdike, di civînê de yekîtiyeke mezin pêk anî û girêdana xwe ya bi Osmaniyan re, ya li dijî Sefewiyan bi nameyekê ragihand. Navê hemû begên beşdar, li ser wê nameyê tên nivîsîn. Yawûz Sultan Selîm jî, bi awayekî rêzdar bersiva wê nameyê dide. Yawûz, daxwaza wê yekê dike ku kurd ji nava xwe mîrnişîneke berfireh ava bikin û mîrê mîran diyar bikin, bersiva begên kurdan ên di bin pêşengiya Idrîsê Bedlîsî de, wiha bû: “Em nikarin di navbera xwe de ji bo mîrê mîran li hev bikin. Ji bo vê hûn ji me re mîrê mîran hilbijêrin”.

Osmanî jî li ser daxwaza mîrên kurdan, mîrekî bi navê Mihemedê bisimbêl dişînin û wî weke mîrê mîran hildibijêrin. Piştî ku ev lihevkirin çêbû, di sala 1514`an de Osmanî û Sefewî li Çaldiranê tên beramberî hev.

## Şerê Çaldêranê:

Ji şerê ku di sala1514`an de li deşta Çaldiranê di navbera Yawûz Sultan Selîm û şahê Sefewiyan Şah Îsmaîl de pêk hat re, Şerê Çaldêranê tê gotin. Yawûz Sultan Selîm dixwest ku sînorên




dewleta Osmanî ber bi Rojhilatê ve fireh bike, metirsiya herî mezin ji bo wî, Sefewî bûn, Sefewî jî li Anetolê hêza wan mezin dibû û bi vî awayî gefek ji bo Osmaniyan diafirandin.

Di vî şerî de Osmanî bi ser dikevin. Şah Îsmaîl reviya û bi zorê rizgar bû. Her wiha Osmaniyan paytexta Safewiyan Tebrîz dagir kirin û bi paş de zivirîn.

Ji ber ku hin mîrên kurdan bi Osmaniyan re li hev kiribûn, Osmanî bi ser ketin. Lê hin ji wan jî peyman bi Osmaniyan re nepejirandin, mîna: Mîrên Çemşkezekan ên li herêma Dêrsimê. Lê dema ku Osmanî bi ser ketin deriyê Rojhilata Navînê ji wan re hat vekirin.

Piştî şerê Çaldiranê, di Rojhilata Navînê de, bandora Osmaniyan roj bi roj zêde dibû. Di encama şerên Mercîdabiq (1516) û Reydaniyê (1517) de, dawî li deshilatdariya Memlûkiyên Misrê anîn. Bi vî awayî deshilatdariya wan li herêmeke berfireh belav bû.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çima Osmaniyan berê xwe dan Rojhilata Navînê?

2. Yawûz Sultan Selîm çi daxwaz ji begên kurdan xwest û bersiva wan çi bû?

3. Sedem û encamên şerê Çaldîranê, vebêje.

**WANE 4**

## PEYMANA IDRÎSÊ BEDLÎSÎ Û YAWÛZ SELÎM

Idrîsê Bedlîsî ji bo birêvebirina Kurdistanê sîstemekê çêdike, pêşkêşî padîşah dike û padîşah jî dipejirîne. Li gorî vê sîstemê hinek erkên ku kurd û hinek erkên ku Osmanî pêk bînin hebûn. Ew jî ev bûn:

## Erkên Kurdan:

**1.** Di dema şer de, dê leşkerên kurd wê beşdarî artêşa Osmaniyan bibin.
**2.** Li gorî mezinahiya xwe her mîrnişîn, dê salane baca xwe bidin Osmaniyan.
**3.** Mîrnişînên kurdan dê sînorên ji wan re hatine diyarkirin, derbas nekin, ango wê êrîşî mîrnişîneke din ya kurdan nekin.
**4.** Dema şerê navxweyî di nav Osmaniyan de çêbibe, dê kurd nebin alîgirê tu kesî.

## Erkên Osmaniyan:

**1.** Li kîjan mîrnişînê dê kî bibe mîr, divê Osmanî destwerdanê nekin. Wê mîrnişîn ji bav radestî kur bibe, heger kur tune be, ji aliyê rûspiyên mîrnişînê ve, mîr were diyarkirin.
**2.** Heger li hember mîrnişînên kurdan dema êrîş pêk werin, divê Osmanî kurdan biparêzin.
**3.** Mîrnişînên kurdan wê weke herêmên serbixwe werin birêveberin, wê Osmanî destwerdana kar û barên hundirîn (dibistan, dadgeh û hwd) nekin.
**4.** Mîrnişînên Kurdistanê wê xweser bin.

Ji vê dîrokê û pê de, Amed û Mêrdîn dikevin nava xaka Osmaniyan de. Idrîs bi navê Yawûz Selîm û bi saya peymana begên kurd, herêmên weke: Ûrmiye, Îtak, Îmadiye, Cizîr, Gêl, Hîzan, Xerzan, Palû, Sêrt, Heskîf, Meyafarqîn û hwd, ango bi giştî 25 herêm bi birêveberiya Osmaniyan ve tên girêdan. Ji ber vê serkeftinê, Yawûz Sultan Selîm, Idrîsê Bedlîsî xelat dike û herêma Amedê weke mewdan (milk) dide Bedlîsî. Wekî din, “Dadgeha Leşkerî Ya Ereb” a ku di sala 1516`an de Yawûz Selîm navenda wê li Amedê ava kiribû, ji Idrîsê Bedlîsî re

dibexşîne. Bi vî awayî, Idrîsê Bedlîsî bi payeya ramyarî ya herî bilind, di dadgeha leşkerî de kirin rayedar. Idrîsê Bedlîsî di sala 1520`an de li Istenbolê dimire.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Di peymana kurd û turkan de, erkên ku têne ser mile her beşekî, bi mamoste û hevalên xwe re parve bike.

2. Piştî hevpeymanê rewşa herêmên kurd çawa bûn?

3. Idrîsê Bedlîsî piştî hevpeymanê çi xelat stand?

## WANE 5

### SERHILDANÊN GEL LI HEMBER OSMANIYAN

Hewildanên Osmaniyan ji bo desthilatdariya xwe li herêmê bidin rûniştandin û imperatoriya xwe ava bikin, bi gelek rêbazan pêk hat. Lewma di herêmê de çi miletên ku dijîn, di qirkirinan re derbas dikirin û kesên ku li ser xaka Kurdistanê dijîn, ji xwe re dikirin armanc. Mîna gelên: cihû, turkmen, belûç û kudên ne sunî.

Osmaniyan ev hişmendî li ser sê pêlan pêk anî:

**1.** Gelên ne misilman.
**2.** Gelên ne turk.
**3.** Kurdên ne sunî (piştî hêza imperatoriyê xurt dibe, kurdan bi tevahî armanc digire).

Sedemên ku Osmaniyan kurdên elewî armanc digirtin ew bû ku ne li ser rêya islama sunî bûn, him jî ji ber piştgiriya wan ji dewleta Sefewî re hebû. Ji ber vê yekê dest diavêjin nirxên gelan û mal û milkên wan ji wan digirin. Li ser vê yekê pir serhildan çêbûn ku vê hişmendiyê nepejirînin û yê herî bibandor ku imperatoriya Osmaniyan xistibû metirsiyê de, serhildanên Elewiyan bûn.

### 1. Serhildana Şêx Bedredîn 1412 - 1420:

Şêx Bedredîn di sala 1359`an de ji dayik bûye. Di warê zanist û felsefeyê de li pêş dikeve û dibe şêxê keleha Ezmîrê. Sîstema ku Şêx Bedredîn meşandiye li ser bingehê jiyaneke wekhev û komînal bû; ango wekhevî di navbera mêr û jinê de û stemkariyê tu carî napejirînin.

Ji ber helwestên dewleta Osmanî tevahî gelên herêmê yên wekî rûm, cihû, belûc û turkmen li dij Osmaniyan serî hildidin û 8 salan berxwedanê dimeşînin. Serhildan ji bajarên Eydin û Manîsa dest pê dike û ji sê cihan êrîşê bi ser Osmaniyan de dibe.

Lê sultanê Osmanî, Mihemedê Yekem artêşekê bi fermandariya wezîrê xwe Beyazîd Paşa bi ser wan de dişîne û hemû mirîdên Şêx Bedredîn bi awaytekî hovane û nemirovî dikujin. Şêx Bedredîn dizîvire Uremanê (li Bolxariyaya îro cihê ku mirîdên Baba Îshaq xwe bicih kirine piştî serhildana wan li dijî Selcûqiyan) lê şêx tê girtin, wî tazî dikin û bi dar ve dikin. Her wiha mirîdên Şêx Bedredîn li hemû gundên herêmê digerandin û doza poşmaniyê li pêşiya gel ji wan dikirin û yê ku ev yek nedipejirand beşek ji laşê wî bi rengekî hovane dihat jêkirin heta ku jiyana xwe ji dest dida.

**2. Serhildana Nûr Elî 1510 - 1512:**

Li Erzincan, Sîwas, Toqat û Dêrsimê li pêş dikeve. Du salan berdewam dike û piştre serokê wê tê kuştin û serhildan tê perçiqandin.

**3. Serhildana Şêx Qulun 1517:**

Serhildaneke qizilbaşiyan e, li derdora Îcê (Ege) û Deriyaya Spî, li pêş dikeve, xwe wekî mirîdê Şah Ismaîl dibînin û li dijî Osmaniyan tev digerin.

**4. Serhildana Celaliyan 1519:**

Derdora Yozqat, Çûrûm, Toqat û Sîwasê, li pêş dikeve. Pir kes tev lê dibin, mîna gundiyên bêerd, kesên ku bac li wan giran bûye, kesên ku erdên wan ji wan hatiye standin û kesên ku desthilatdariya wan ya herêmî ji destê wan derketiye. Ev hêza gelêrî bi pêşengiya Şêx Celal xwe bi Sefewiyan re dide girêdan û li dijî Osmaniyan şer dikin. Lê dema ku êrîşên dijwar ji hêla Osmaniyan ve dest pê dike, tevahî kesên ku tev li wê bûne, dest jê berdidin û di sala 1519`an de, Şêx Celal tê kuştin. Piştî wî çi serhildanên ku li pêş dikevin di herêmê de navê serhildanên Celalî li wan tên kirin.

**5. Serhildana Baba Zenûn 1526:**

Derdora Yozqat Toqat dest pê kir û li Qeyserî û Mereşê belav bû, lê di 26`ê Îlona 1526`an de Baba Zenûn tê kuştin û serhildan bi dawî dibe.

**6. Serhildana Qelender Çelebî 1527:**

Li Toqat, Yozqat û Sîwasê dest pê kir û li Qeyserî, Meleltî û Semsûrê belav bû. Di 22`yê bûşbera 1527`an de, Çelebî û hevalên wî têne kuştin û serehildan têk diçe. Lê mirîdê wan carcaran serhildanê berdewam dikin. Serhildana Pîr Sultan Evdal berdewamiya wan e.

**7. Serhildanên Qereyazî 1600 - 1601:** Li Riha, Mereş û Sîwasê dest pê dike û belav dibe.

**8. Serhildana Canpolat Oxlo 1605 - 1607:** Li derdora Sîwas û Meleltîyê belav dibe.

**9. Serhildana Qelender Oxlo 1605 - 1608:** Li Sîwas, Mereş û Yozqatê belav dibe.

Ev serhildanên gel di sedsalên 16 û 17`an de û di cihên ku kurdên Elewî tê de dijîn gur dibe. Bi armanca valakirina desthilatdariya Osmaniyan li ser herêmê, ev serhildanên gel tu caran ranewestiyan. Bi dehan serhildan di demên cuda de agirê wan gûr dibe, mîna: Serhildanên di salên 1526-1528-1595-1610-1654-1655-1658-1659`an de û rewşa imperatoriyê her dem dixist metirsiyê. Li hember vê yekê pir kumkujî, talankirin û gelek rêbazên hovane, hatine bikaranîn.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1.** Osmaniyan kîjan gel ji xwe re dikirin armanc?

**2.** Şêx Bedredîn sîstema xwe li ser çi bingehî ava kiriye?

**3.** Bi çi awayî Osmaniyan serhildanên elewiyan perçiqandin?

**WANE 6**

## REWŞA ROJHILATÊ KURDISTANÊ DI BIN DESTHILATDARIYA SEFEWIYAN DE

Li Rojhilatê Kurdistanê dewleta Îranê sîstema Ilxanetiyê li pêş xist. Xwestiye ku li Kurdistanê sîstemeke weke ya Osmaniyan ava bike, lê weke Osmaniyan sîstema xwesertiyê nedan kurdan. Dewletê derfet neda ku kurd bi awayekî xweser xwe bi rê ve bibin. Sefewiyan ew di herêmên cuda yên dewletê de ji bo parastina sînoran, bikar anîne.

Mînak: Ji bo ku rojhilatê bakûrê Îranê ji êrîşên  Ozbekan biparêzin,  êlên wekî  Şadî, Zeferanî, Keyuwanî û Çeknî, li Rojhilatê Kurdistanê, şandin Xorasan û Guşanê. Navên mîrenîşên kurd ên girêdayî Qesra Îranê, ev bûn: Kotur, Pirdevzî, Cewlanî, Dimdimî û Denbûlî.

Di nav safewiyên  ku li ser rêbaza şîatiyê dimeşim û kurdên ku piraniya wan sunî bûn de,  her tim bêewlehî hebû. Ji ber vê yekê serhildanên kurdan ên li hember Sefewiyan zû dest pê kir. Êlên Beradostê di sala 1606`an de li hember Sefewiyan serhildaneke bêhempa nîşan dan.

### **Serhildana Keleha Dimdimê**:

Serhildana Keleha Dimdimê destaneke kurda ye ku di navbera 1606 û 1610`an de, li dar ketiye.

Ev serhildan, ji hêla êla Dostekî ve di Keleha Dimdimê de li dar dikeve. Keleha dimdimê nêzîkî bajarê Urmiyeyê ye. Qehremanê vê destanê Emîr Xanê Lepzêrîn e. Emîr Xan di şerekî de, ji ber ku alîkariya begê Soranê dike destekî wî ji hêla serdestan ve tê jêkirin. Di dema Şah Ebas de destekî zêrîn jê re tê çêkirin (lewma jê re lepzêrîn tê gotin). Berpirsiyariya herêma Mirgever, Urmiye, Şîno û derdora wan radestî wî dikin. Dewleta Sefewî wî weke metirsiyekê li ser hebûna xwe dibîne lewma şer di

navbera wî û Sefewîyan de derdikevin. Di Keleha Dimdimê de, wek qehremanekî salekê ber xwe dide, lê êrîşkar di rêya xiyaneteke kesekî kurd re, hînî cihê qanala avê dibin û ava kelehê qut dikin. Di kelehê de ji ber qutbûna avê gelek tengasiyan dikşînin. Lê disa jî heta şervanê dawî li ber xwe didin.

Taybetiya vê serhildanê ew e ku di vê kelehê de yê ku destê wî çek digre û dikare şer bike, di xeta azadiyê de bi biryareke xurt



**Keleha Dimdimê**

heta dawiyê tev ber xwe didin û tev jî jiyana xwe ji dest didin. Dema ku tevahî şervanan jiyana xwe ji dest didin, pîr, jin û zarokên ku nikaribûn di şer de cih bigrin ji bo ku nekevin destê neyaran de kelehê tevî xwe dişewitînin û xwe tune dikin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1.** Çima serhildanên kurdan li hember Sefewiyan dest pê kirin?

**2.** Kî xwediyê destana Kelha Dimdimê ye û çima ev nav lê hate kirin?

**3.** Çawa serhildana kelha Dimdimê bi dawî dibe?

## WANE 7

# PEYMANA QESRA ŞÊRÎN

Ev peyman, bi encama qezençkirina Osmaniyan a şerê Bexdê, li pêş ketiye. Şerê di navbera Osmanî û Sefewiyan de bi awayekî fermî bi dawî dibe. Ev hevpeyman, li ser bingehê windahiyên di şerên navber ên ji 1623`yan û heya 1639`an de pêk hatine, pêk tê. Piştî şerên Rewan û Bexdê, her du alî jî dibin xwedî helwesteke aştî û di 17`yê Gulana 1639`an de, hevpeymanek di navbera wan de tê imzekirin, di encamê de xaka Kurdistanê tê parçekirin.

Ev parçebûn ne tenê fîzîkî û erdnîgarî bû, di heman demê de çandî û ramanî jî bû, ji ber ku parçeyê herî bi bandor ê çanda kurdî jê hat qutkirin. Ango mejiyê civaka kurd hat parçekirin.

**Xalên girîng ên hevpeymanê, ev in:**

1. Wê dawî li şerê di navbera her du aliyan de bê.
2. Wê Ahiska û Rewanê ji dewleta Sefewiyan re bimînin.
3. Wê Bexda û Besrayê ji Osmaniyan re bimînin.
4. Wê sînorên her du dewletan her dem weke xwe bimînin.

**Ehmedê Xanî** bandora peymana Qesra Şêrîn a li ser jiyana kurdan bi vê helbestê tîne ziman:

Tasek ji vê ava zelal

Nadim bi hewza Kewserê

Lihevhatina Qesra Şêrîn

Lê nabînim tu meferê

Piştî roja me bû tarî

Mirin xweş e ji emberê.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1.** Parçebûna Kurdistanê di peymana Qesra Şêrîn de, parçebûneke çawa bû.

**2.** Peymana Qesra Şêrîn li ser çi bingehî hate imzekirin?

**3.** Xalên hevpeymana Qesra Şêrîn, diyar bike.

# FERHENGOK

| | |
|---|---|
| **Bertek** | Rîflêks, Bersiv, cewab |
| **Cizye** | Pereyên ku bi zorê ji kesên ne misilman tên standin |
| **Bac** | Pereyên ku bi zorê ji kesekî tê standin weke derîbeyekê li ser erdê wî |
| **Parêzger** | Walî, berpirsê herêmekê girêdayî navenda islamê |
| **Stratejî** | Plan ji bo birêvebirina karekî domdar |
| **Şêwirdarî** | Hilbijartina bi dengdanê |
| **Derhoze** | Mûcîze , tiştekî ecêbe |

# Belavkirina Waneyan Li Ser Sala Xwendinê

| Heftî / Heyv | *Heftiya Yekem* | *Heftiya Duyem* | *Heftiya Sêyem* | *Heftiya Çarem* |
|---|---|---|---|---|
| ***Rezber*** | | | Iskender û Helenîzim | Roma |
| ***Cotmeh*** | Berxwedan a gelan | Komegene | Sasanî + Manî | Mazdekî |
| ***Mijdar*** | Hz. Mihemed | Felsefeya Hz. Mihemed | Derbasbûna islamê ya nava Kurdistanê | Emewî |
| ***Berfanbar*** | Ebasî | Dogmatîzi ma olî | Tevgerên li dijî islama dijber (1) | Tevgerên li dijî islama dijber (2) |
| ***Rêbendan*** | **Lêveger** | **Nirxandin** | **Bêhinvedan** | **Bêhinvedan** |
| ***Reşemeh*** | Mîrnişînên kurd (1) | Mîrnişînên kurd (2) | Êrîşên xaçperestan | Selcûqî |
| ***Avdar*** | Mexol | Holako | Osmanî | Sefewî |
| ***Cotan*** | Peymanên di navbera kurd û Osmaniyan de | Idrîsê Bedlîsî û Yawûz Selîm | Serhildanên gel li hember Osmaniyan | Rojhilatê Kurdistanê di bin desthilatdarê ya Sefewiyan de |
| ***Gulan*** | Peymana Qesra Şêrîn | **Nirxandin** | | |